

DANASÎNA KEŞKÛLEKE MELA NEZÎRÊ HERGEMOYÎ

MOLLA NEZİR HERGEMOYÎ'NİN BİR KEŞKÛLÜNÜN TANITIMI

DESCRIPTION OF A KASHKÛL BY MÛLLAH NEZİR HERGEMOYÎ

Nurettin ERTEKİN*

Kurte

Keşkûl an mecmu'e ji bo edebiyata klasîk çavkaniyên giring in. Yek ji giringiya keşkûlan ev e ku di van berheman de di derbarê şî'r û şa'irên nenas de agahî dihên bidestxistin. Keşkûl, ji bo edebiyata Kurdî ya klasîk bêtir bi nirx û giring in. Lewra hetanî roja me gelek şa'ir û şî'rên nuh yên edebiyata Kurdî ya klasîk bi rêya keşkûlan dikevin lîteratura edebiyatê. Keşkûleke Mela Nezîrê Hergemoyî yek ji van keşkûlan e ku di vê keşkûlê de hinek şî'r û şa'irin nenas cih digirin. Di vê xebatê de em li ser danasîna vê keşkûlê û nasandina şî'rên wê sekinin. Me derbarê şa'irên bi rengekî din dihên nasîn, agahî dan. Di encamê de me dît ku di vê keşkûlê de gelek şî'rên şa'irên heta niha neketine qada edebiyatê cih digirin. Herweha du şî'rên Feqîyê Teyran cara yekem bi vê xebatê derdikevin holê. Xalên bi vî rengî qîmeta vê keşkûlê zêdetir kiriye ku bibe mijara xebateke akademîk. Ev keşkûl, ji ber amûrên xwe yên resen tîkariyê dide edebiyata Kurdî ya klasîk û wê şayeste dike ji bo nirxandineke akademîk. Ev xebat, ji bo nirxa edebî û dîrokî ya vê keşkûlê derxîne holê û zêdahiya wê ya li qadê ji xwe re kiriye armanc.

Peyvên Sereke: Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Keşkûl, Mecmû'e, Feqîyê Teyran, Mela Nezîrê Hergemoyî.

Öz

Klasik edebiyat araştırmalarında birincil kaynak niteliği taşıyan keşkûl veya mecmualar, bilinmeyen şairlerin ve şiirlerinin keşfedilmesinde kritik öneme sahiptir. Bu derlemeler, özellikle Klasik Kürt edebiyatının tarihsel sürecinde hayati bir rol oynamakta olup, çok sayıda şair ve eserlerinin günümüz edebiyat literatürüne kazandırılmasında temel kaynak işlevi görmüştür. Bu bağlamda, Molla Nezîr Hergemoyî'nin derlediği keşkûl, içerdiği özgün materyal bakımından dikkat çekici bir örnek teşkil etmektedir. Bu araştırmada, söz konusu keşkûlün sistematik analizi gerçekleştirilmiş, içerdiği şiirler detaylı bir şekilde incelenmiş ve farklı yönleriyle tanınan şairlere ilişkin kapsamlı dipnotlar sunulmuştur. Çalışmanın en önemli bulgularından biri, şimdiye kadar literatürde yer almayan bazı şair ve şiirlerin ilk kez tespit edilmesi olmuştur. Özellikle, Klasik Kürt edebiyatının önde gelen şairlerinden Feqîyê Teyran'a ait, daha önce bilinmeyen iki şiirin keşfi, araştırmanın özgün katkıları arasında yer almaktadır. Bu keşkûlün, Klasik Kürt edebiyatına yaptığı katkılar ve içerdiği özgün malzeme, onu akademik bir inceleme konusu olarak değerli kılmaktadır. Bu çalışma, söz konusu keşkûlün edebi ve tarihsel değerini ortaya koyarak, alan literatürüne önemli bir katkı sunmayı hedeflemektedir.

Anahtar Kelimeler: Klasik Kürt Edebiyatı, Keşkûl, Mecmua, Fakı-yi Teyrân, Molla Nezîr Hergemoyî.

Abstract

Kashkûl or miscellanies, which serve as primary sources in classical literature research, are of critical importance in discovering unknown poets and their poems. These compilations play a vital role, particularly in the historical process of Classical Kurdish literature, and have functioned as fundamental sources in bringing numerous poets and their works into contemporary literary literature. In this context, the miscellany compiled by Mûllah Nezîr Hergemoyî represents a remarkable example in terms of its original material. In this research, a systematic analysis of the said miscellany was conducted, the poems it contains were examined in detail, and comprehensive footnotes were provided regarding poets known for their different aspects. One of the most significant findings of the study has been the first-time identification of some poets and poems previously absent from the literature. In particular, the discovery of two previously unknown poems belonging to Faqîyi Tayrân, one of the prominent poets of Classical Kurdish literature, is among the original contributions of the research. The contributions of this miscellany to Classical Kurdish literature and its original material make it valuable as a subject of academic examination. This study aims to make a significant contribution to the field literature by revealing the literary and historical value of the miscellany in question.

Keywords: Classical Kurdish Literature, Kashkûl (Miscellanies,), Faqîyi Tayrân, Mûllah Nezîr Hergemoyî.

DESTPÊK

Yek ji çavkaniyên edebiyatê keşkûl in. Keşkûl, weke têgih; navê giştî yê wan pirtûkan nin ku di wan de mijarên ciyawaz û ne li gorî rêbazeke taybet hatine nivîsîn. Di keşkûlan de mijarên ciyawaz weke; tefsîrên Quranê, ayet, hedîs, dastanên balkêş, şî'rên zimancuda, pend, dîrok, erdnîgarî, ferheng, ramanên exlaqî, hizrên felsefî, gotinên pêşîyan, henek û pêkenok cih digirin (Cezayîrî, 1333, r. 24-44). Ji ber vê mirov dikare bibêje ku di her warî de keşkûlek dikare were nivîsîn.

Yek ji majarên keşkûlan şî'r û menzûme nin. Di van keşkûlan de dibe ku ji hemû teşeyên nezmê şî'r cih bigirin (Xilxalî, 1370, r 42-43). Cihgirtina şî'r û menzûmeyan bi tevahî li gorî zewqa muellifî ye. Ji ber vê, pîvana helbest û mijarên dîtir, kurtbûnî û dirêjbûniya wan di her keşkûlekê de ciyawaz e.

Keşkûl, an bi navekî din mecmu'e ku berhevokên kesayetên hezkirîyên edebiyatê nin, ji bo edebiyata klasîk çavkaniyên girîng in. Xasma ji bo edebiyata Kurdî ya klasîk giringiya wan zêdetir e. Lewra gelek helbest û şa'ir bi rêya keşkûlan ketine lîteratura edebiyata Kurdî.¹

Mela û şêxên Kurdan bi piranî hezkiriyên şî'rê nin û helbestên ku ji wan hez dikirin di keşkûlan de ji xwe re dicivandin. Yek ji van hezkiriyên şî'r û edebiyatê Mela Nezîrê Hergemoyî ye. Di vê xebatê de em li ser keşkûleke Mela Nezîr sekinîn. Ev xebat ji du beşan pêktê. Di beşa yekem de em bi kurtasî li ser jiyana Mela Nezîrê Hergemoyî sekinin û berhemên wî nasand. Di beşa duyem de jî me danasîna keşkûlê kir û li ser helbestên di keşkûlê de rawestiyân.

1. Kurtejiyana Mela Nezîrê Hergemoyî

Mela Nezerî Hergemoyî di sala 1933ê yan de li gundê Hergemo (Bölükkonak) hatiye dinê. Hergemo, gundek ji gundê navçeya Hezo (Kozluk) ya Êlihê (Batman) ye. Navê bavê wî Salih e. Salih kurê Resûl, Resûl jî kurê hemik e. Malbata wî li herêmê bi Malbata Hemik tê nasîn. Navê dayika wî Sara ye. Bavê Mela Nezîr du jin aniyê. Mela Nezîr û birayê xwe yê mezin Mela Hewes ji Sara ne (Özbek, 2023, r 1; Bozkur, 2024, r 10; Öz, 2023, r 333).

Bavê Mela Nezîr, Salih, ji mela û 'alim û kesên zana hezdikir. Ji ber vê hezkirinê herdu lawê xwe Mela Hewes û Mela Nezîr dişîne feqîtiyê. Mela Nezîr, pêşî li gundê xwe dest bi xwendinê dike. Bi teşwîqa birayê xwe Mela Hewes, pêşî li Baştrimê (Aşağı Kıratlı) ku gundeki Hezo ye li ba Mela Esad dixwîne. Mela Esad, melayê zekatê ye û di heman demê de mêrê xwuşka wî Meryemê ye. Piştê demekê li gundê Roşederan li cem Mela 'Eliyê Zoqeydî xwendina xwe

¹ Weke mînak bnr: (Aykaç, 2022) û (Aykaç, 2021).

didomîne. Ji Reşedoran dihê neavenda Hezo û li Mizgefta Şemdînağa li cem Mela ‘Elî dixwîne. (Özbek, 2023, r 2; Bozkur, 2024, r 11; Öz, 2023, r 334).

Di feqîtiyê de demekê li li gundê Qesrik (Narlıdere) ku girêdayî bi Bedlîsê ve ye li cem Şêx 'Ebdulhekîm el-Huseynî (Qesrewî) (1902-1972) ku şêxê terrîqeta neqşebendiyan e xwendina xwe didomîne. Di vê demê de dibe murîdê Şêx 'Ebdulhekîm el-Huseynî û dest bi perwerdehiya tesewufê dike. Di derbarê wergirtina îcazetnameya îlmî de di destê me de agahî nîn e. Piştî demekê, pêşî li gundê Torxê (Yuvalıdam Köyü) ku gundeki Motkî ya Bedlîsê ye du salan melatiya zekatê dike. Piştî du salan melatiyê dike diçe leşkeriyê. Piştî vegera ji leşkeriyê demekê li ba Mela Hesîbê kurê Mela Nesreddînê Zoqeydî (1890-1935) dixwîne. Ji bo xwendina xwe bidomîne dîsa vedigere medreseya Şêx 'Ebdulhekîm el-Huseynî (Özbek, 2023, r 2; Bozkur, 2024, r 12).

Şêx 'Ebdulhekîm el-Huseynî, ji bo Melatiyê careke din wî dişine gundê Torxê ji bo melatiyê. Vê carê 17 salan melatiya vî gundî dike. Piraniya berhemên xwe di van salan de dinivîse. Di heman demê de di hicreya mizgefta gundî de dersa feqîyan dide. Feqiyên wî bi piranî biraziyên wî, zaroyên wî û zarokên gund bûn. Ji ber ku gund bi lehçeya Zazakî diaxivîn xwe hînê Zazakî jî dike (Özbek, 2023, r 2).

Ji gundê Torxê bi destura şêxê xwe mala xwe diîne navenda Êlihê û li Mizgefta Qesrewî melatiya fexrî dike. Di heman demê de di vê mizgeftê de vekiliya şêxê xwe ya terrîqetê dike û sofîyan perwerde dike. Li gundê Bediya (Oymataş) ku girêdayî Êlihê ye dest bi melatiya fermî dike û hetanî ku rehmet dike li vî gundî dimîne. Mela Nezîr di sala 2002yan de li Êlihê rehmet dike û li goristana Şiltê dihê veşartin (Özbek, 2023, r 2-3; Öz, 2023, r 334-335).

Mela Nezîr, bi keça meta xwe besna xanimê re dizewice. Ji vê zevacê duwazde zarok werin dunyayê jî heft zarok hêja ku biçûk bûn wefat dikin. Ji zarokên wî Mela Tewfîq, Vahdeddin, Bahruddîn, Mela Fexreddin, Fatma ve Sevda aneşa tenê herdu keçên wî li jiyane ne (Özbek, 2023, r 3; Bozkur, 2024, r 11).

1.1 Berhemên Mela Nezîrê Hergemoyî

Mela Nezîrê Hergemoyî kesayetekî piralî ye. Hem ‘alim e, hem mutesewif e, hem şa‘ir e, hem nazim e û hem jî wergêr e. Ev taybetiyên wî ji berhemên wî eşkere diyar dibin. Di heman demê de nivîskarekî çar zimanî ye. Bi Kurmancî, Zazakî, ‘Erebî û Tirkî nivîsandiye. Li gorî tespîtên Ömer Özbek berhemên Mela Nezîr ev in:

1. *Dîwan*. Ji helbestên Mela Nezîr pêk hatiye. Ziman Kurmancî ye.²
2. *Es-Sirru'd-deqîq fî adâbi't-terîq*. Di derbarê rêgezên terîqetê de ye.
3. *Te'lîmat û Adâbên Terîqê*. Wegera Es-Sirru'd-daqîq fî adâbi't-tarîqê ye.
4. *Esmâu Sâdâtî'n-Neqşibendiyye*. Berhem bi Kurmancî ye û behsa navên pîrên terîqeta Neqşebendî dike.
5. *Kîtâbu'l-ferâid el-Mûsemma bî Menzûmâtî'l-'Eqâid*. Mijara berhemê 'eqîde ye.
6. *Nezma Pirtûka 'Eqîda Şêx Fethullahê Werkanisî*. Berhema pexşan ya Şêx Fethullahê Werkanisî bi nezm nivîsandiye.
7. *Esmâu'l-Husnâ*. Navên Xweda yê herî xweşik bi nezm nivîsandiye, ziman 'Erebi ye.
8. *Esmâu'n-Nebî*. Navên Pêxemberê Xweda (s.a.w.) bi nezm aniye ziman, berhem 'Erebî û Kurmancî ye.
9. *Esmâu'r-Rusûl*. Navê Pêxembera mijara berhemê ye.
10. *Esmâu's-Sehâbe*. Wegera berhema *Seyfu'l-bettâr* ya Mevlânâ Halîd eş-Şehrezûrî el-Kurdî ye (w.1827).
11. *'Eqîda Îmânê*. Ev berhem nezm e û bi Kurmancî ye.
12. *Dû'a*. Di derbarê girîngiya laveyan de ye.
13. *Wegera Mewlûda Xasî*. Mewlûda Mela Ehmedê Xasî (1866/67-1951) ji Zazakî bi nezm wergerandiye Kurmancî.
14. *Nâvên Giyâyan*. Behsa giya û nexweşiyên dike.
15. *Neqlun mîn Fethi'l-mu'în fî Muhîmmati'd-dîn*. Berhem derbarê fiqhê de ye.
16. *Nezmu'z-Zevâcir 'en Îqtirâfî'l-kebâir*. Wegera berhema Îbn Hecer el-Heytemî *ez-Zevâcir 'en iqtirâfî'l-kebâir e*.
17. *Esmâu Ecdâdî'n-Nebî*. Bi nezm û bi Kurmancî navên bav û bapîrên Pêxember (s.a.w) hatiye vegotin.
18. *'Eqîdetu'l-îmân bi'l-Kurdiyye*. Mijara berhemê 'eqîde ye, menzûm û Kurmancî ye.
19. *Delâilên li Ser Hebûna Xwedê*. Delîlên li ser hebûna Xweda bi nezm aniye ziman.
20. *'Elâmâtu Yevmi'l-qiyâme*. Berhem di derbarê 'elametên qiyametê û bûyerên axretê de ye.
21. *Hedîsên li ser 'Elametên Qiyametê*. Hedîsên derbarê 'elametên qiyametê bi nezm û kurmancî hatiye hûnandin.
22. *Wefâtu'n-Nebî*. Pêvajoya wefata Cenabê Pêxember (s.a.w) mijara berhemê ye.
23. *Ehâdisu'l-erbe'în*. Berhem bi nezm û bi Kurmancî çil hedîsa vedibêje.
24. *Nezmû Fethi'l-Mû'în bi Şerhîhî Î'âneti't-tâlibîn*. Mijara berhemê fiqh e.

² Nivîskarê vê gotarê dîwana Mela Nezîr ji bo çapê amade dike.

25. *Nezmû Necâtu 'l-xâfilîn fi 'l-kebâiri ve 's-sexâiri 'Elâ Mezhebi 'l-Henîfiyye*. Mijar fiqh e.
26. *Kîtâbu 'n-nikâh*. Nîkah û mijarên bi wê têkaldar di berhemê de cih digirin.
27. *Furûdât*. Tiştên ku ferz in însan bikin bi nezm û bi Kurmancî aniyê ziman.
28. *Tertîbu 'l-îsqât*. Behsê dike ji îsqata miriyan.
29. *'Ewamîlu 'l-menzûm*. 'Ewamila 'Ebdulqahir el-Curcânî' (w. 1078) bi nezm wergerandiye Kurmancî.
30. *Qit 'eyê Şer 'iyye Tuhfeyê Wehbiyye*. Wergera hinek beşên ferhenga menzûm *Tuhfe-i Wehbî* ya Sunbulzade Wehbî (w. 1809) ye.
31. *Tercumetû Qesîdeti 'l-meferiyye li 'l-Îmâm Bûsîrî*. Wergera qesîdeyê Bûsîrî (w. 1296) ye.
32. *Tercumetû Burdeti 'l-medîh bi 'n-nezmî fi Medhi 'n-nebî*. Wergera Burde ya Bûsîrî ye.
33. *Nesîhetû 'Ettâr*. Wergera Pendnameya Ferîduddîn 'Ettar (w. 618/1221) e.
34. *Serpêhatiya Eba Yezîdê Bestamî û Rahibên Dêrê*. Berhem menzûm û Kurmancî ye (Özbek, 2023, r 4-9).

2 Danasîna Naveroka Keşkûla Mela Nezîrê Hergemoyî (Berg 9)³

2.1 Danasîn (Tewsîf) a Keşkûlê

Navê Berhemê:	Ji bo berhemê nav nehatiye diyarkirin.
Cureyê Berhemê:	Keşkûl /Mecmû'e
Navê Pirtûkxaneyê:	Ev berhem ji Sofî Emîn hatiye stendin. (29.07.2023)
Zimanê Berhemê:	Kurdî, 'Erebî, Farsî
Mustensix:	Mela Nezîrê Hergemoyî. Lê divê bê gotin li ser berhemê navê mustensixî nehatiye nivîsîn.
Taybetiyên Bergê:	Bê berg e.
Taybetiyên Kaxizê:	Rengê kaxizê zer e. Hejmara rêzan di her rûpelekî de cuda ye.
Hejmara Wereqan:	Bi tevahî 96 wereq e.
Ebadên Keşkûlê:	20x26,5 cm.
Cetwel:	Li dora rûpelên keşkûlê çerçove nehatiye xêzkirin.
Dîroka Îstînsaxê:	Tune ye.
Rengê Murekkebê:	Bi murekkeba reş hatiye nivîsîn.
Pêşîya Nusxeyê:	Bi helbesta Hezreti Ebûbekir (r.a) dest pê dike.
Paşîya Nusxeyê:	Di dawiyê de helbestek Şêx 'Ebdulhelîm cih girtiye.

³ Hemû berhemên Mela Nezîrê Hergemoyî ji teref Ömer ÖZBEK û nivîskarê vê gotarê ve ji Sofî Emînê Batmanî hatin wergirtin. Li zanîngeha Colemêrgê hatin dijîtalîzekirin. Her berhemek nav lê hate danîn. Navê vê Keşkûlê di arşîwa me de "Berg 9" e.

- Sernav:** Di serê hemû helbestan de sernav hatine nivîsîn.
- Derkenar:** Derkenar nehatine nivîsîn.
- Te'qîbe/Payende:** Di hinek rûpelan de diyar e.
- Taybetiyên Din:** Rûpela 12an û ya 58an vala ye. Hinek sernavên helbestan nayên xwendin. Herweha hinek malik û bêjeyên helbestan jî nayên xwendin. Di hinek rûpelan de kaxizek din bi rûpel hatiye zeliqandin. Li ser rûpela 30 yê hejmara 184 hatiye nivîsîn. Li ser rûpela 31 ê hejmara 215 hatiye nivîsîn. Ji vê yekê diyar e ku hem serê keşkûlê wenda ye û hem jî wereqên nav keşkûlê wenda nin. Herweha ihtîmal e ku dawîya keşkûlê jî kêmbê.

2.2 Naveroka keşkûlê

Di vê keşkûlê de herçend ku hinek helbestên 'Erebî û Farsî cih girtibin jî ev keşkûl keşkûleke Kurmancî ye. Li jêrê emê danasîna helbestên di keşkûlê de ne bikin. Helbestên di keşkûlê de li gor edebiyata neteweyan hatin tesnîfkirin. Herweha ku ji helebestekê zêdetir helbestên şa'irekî hebin hemû helebestên wî di binê navê wî de hatin rêzkirin. Helbestên ku em dizanin yê kîjan şa'irî ne, me navê wan nivîsî û di derbarê jiyana wan de di jêrenotan de bi kurtasî agahî da. Helbestên ku em nizanin yê kê nin di binê serenavekî de hatin civandin. Hinek helbest mersiye û medîheyên derbarê şêxê terîqeta de nin. Di derbarê wan kesayetan de jî di jêrenotan de agahî hatin dayin. Malika yekem û malika dawî ya helbestan hatin nivîsîn. Malikên 'Erebî û Farsî me bi tîpên Aramî û Latînî nivîsî û wateya wan bi Kurdî da. Herweha me teşe û cureyên edebî yê helbestan dîyar kir.

2.2.1 Helbestên Edebiyata 'Erebî

Di keşkûlê de ji edebiyata 'Erebî yek helbest cih digire.

1. Helbesta Hezretî Ebûbekir (r.a)

Sernavê helbestê weha ye: "Hazîhî qesîdetû Ebabekir es-siddîq Redîyel-lahû 'enh". Anku; Ev qesîdeya Hezretî Ebûbekirê Siddîq e, Xweda jê razî be. Helbest bi tevahî 11 malik e û zimanê wê 'Erebî ye. Ji teşeyên nezmê qesîde û ji cureyên nezmê munacat e.⁴

مُفْلِسٌ بِالصِّدْقِ يَأْتِي عِنْدَ بَابِكَ يَا جَلِيلِ

Cud bî lutfike ya Îlahî men lehû zadun qelîl

جُدْ بِإِطْنُوكَ يَا إِلَهِي مَنْ لَه زَادٌ قَلِيلِ

Muflisun bi's-sidqî yetî 'inde babîke ya Celîl⁵

...

⁴ Ev qesîde di pirtûkxaneya Destnivasan ya Zanîngeha Dokuz Eylûlê de di keşkûleke bi hejmara; 4112/14 û di wereqên 73a-b de cih digire. (<https://yazmaeserler.deu.edu.tr/kasidetu-ebi-bekir-es-siddik-73a-b/>. Pêgihîn: 20.12.2024). Herweha di keşkûla Mela Şeyxmûs de jî cih girtiye. Bnr: (Şeyxmûs, 2014, r 17-18).

⁵ Ya Îlahî! Bi lutfaxwe bexşende be ji bo wan kesên qûtê wan kêmbê, muflis in lê bi rastgoyî hatine ber dergahê te ya Xwedayê Celîl.

أَنْتَ يَا صِدِّيقُ عَاصِي تَتَّبِ إِلَى الْمَوْلَى لَجَلِيلِ

Eyne Mûsa, Eyne 'Îsa, eyne Yehya, eyne Nûh

أَيْنَ مُوسَى أَيْنَ عِيسَى أَيْنَ يَحْيَى أَيْنَ نُوحِ

Ente ya Siddîqu⁶ 'asi⁷ tub île'l-Mewle'l-Celîl⁸

2.2.2 Helbestên Edebiyata Farsî

Sê helbestên şa'irên edebiyata Farsî di keşkûlê de bi cih bûne.

2.2.2.1 Helbestên Şemsê Tebrîzî⁹

1. Sernavê helbestê weha ye: "Hazîhî qesîdetû Şemsê Tebrîz ketebet min hifzîhî fela tûbalî fî tertîbîhî." Anku: Ev qesîdeya Şemsê Tebrîzî ye li gorî tiştê di hişê min de maye min nivîsî. Min guh nedaye tertîba wê. Bi tevahî heyşt malik e. Bi teşeya xezelê hatiye nivîsandin ji cureyên nezmê munacat e. Ziman Farsî ye. Ev helbest di Dîwana Şems de cih nagire. (Frûzanfer, 1375). Herweha di malpera ku cih daye şa'irên klasik yê edebiyata Farsî û berhemên wan de jî cih nagire. (<https://ganjoor.net/moulavi>: Pêgihîn: 03.01.2025)

از دردی بی قرارم فریادی رس الاهی کس نیست جز ته یارم فریادی رس الاهی
Ez derdî bî qerar im feryadîres Îlahî Kes nîst cuz te yar em feryadîres Îlahî¹⁰

...

شمسی گناهی کرده نامش سیاهی کرده عمرش تباهی کرده فریادی رس الاهی
Şemsî gunahî kerde nameş siyahî kerde 'Umreş tebahî kerde feryadîres Îlahî¹¹

2. Helbest bi vî sernavî ye: "Haza qesîdetu qale Şems Tebrîzî." Wate: Ev qesîde Şemsê Tebrîzî gotiye. Mijara helbestê li hember hebûna Xweda tunekirina nefse ye, di keşkûlê de 7 malik e, ziman Farsî ye û bi teşeya xezelê hatiye hûnandin.¹²

چه تدبیر ان مسلمانم که من خود را نمی دانم نه ترسا و یهودیمه نه کبر و نه مسلمانم

⁶ Siddîq, di malikê de mexlesa şa'irî ye û di heman demê de leqeba wî ye.

⁷ Ehlên tesewufê dema vê malike dixwînin ji bo hurmet û gramiya Hezretî Ebûbekir (r.a) peyva " 'asi" bi peyveke dîtir vediguhêzin. Weke ku Mela Şeyxmûs di keşkûla xwe de bi peyva "sadiq" veguhêztiye. Bnr: Şeyxmûs, 2014, r 18)

⁸ Kanî Mûsa, kanî 'Îsa, kanî Yehya, kanî Nûh! Tu ya Siddîqê isyanke tobe bike li ba Mewlayê xwe yê Celîl.

⁹ Mebest jê "Dîwana Şemsê Tebrîzî" ye. Weke ku dihê zanîn helbestên Mewlana Celaleddînê Belxî (Rûmî) yê ne di mesnewîya wî de bi navê Xezeliyatê Şems, Dîwana Kebîr, Kulliyatê Şemsê Tebrîzî û Dîwana Şemsê Tebrîzî dihên nasîn.

¹⁰ Ji bo derdê min yê bê aram di hewara min de were ya Îlahî! Ji te pê ve dostê min nîne di hewara min de were ya Îlahî!

¹¹ Şems guneh kiriye, navê xwe reş kiriye, temenê xwe heba kiriye, di hewara min de were ya Îlahî!

¹² Ev xezel jî di Dîwana Şems de cih nagire. Lê di hinek malperên farsî de em rastî vê xezelê hatin. Di hinek malperan de ev xezel 12 malik e. Bnr: (<https://gysarag.blogfa.com/post/27>: Pêgihîn: 04.01.2025) Di hinek malperan de 13 malik e. Bnr: (<https://steemit.com/rumi/@tamim/h-tdb-r-a-muslimanan>: Pêgihîn: 04.01.2025) û (<https://daftaredel42.blogfa.com/post/302>: Pêgihîn: 04.01.2025) Di heman demê de di malpera ganjoor.net ê de di ravekirina çarînek Mewlana de amaje bi vê xezelê dihê kirin û di vê malperê de ev xezel 25 malik e. Bnr: (<https://ganjoor.net/moulavi/shams/ghazalsh/sh633#comment-113713> Pêgihîn: 04.01.2025)

Çi tedbir en Musulmanem kî men xud ra nemî danem Ne tersa û Yehûdî me ne Gibr û ne Musulmanim¹³
 ...
 چه می ترسی چه می لرزی نه میدانی کو رحمانم آلا ای شمس تبریزی تو در عالم شکر ریزی
 Ela ey Şemsi Tebrîzî tu der 'alem Şekerrîzî Çi mî tersî çî mî lerzî ne mîdanî ku Rehmanim^{14, 15}

3. Sernavê helbestê bi vîrengî ye: "Hazîhî qesîdetun qale Şems et-Tebrîzî quddîse sîrrûhû 'ela Şahê Neqşebend quddîse qîrrûhû." Wate: ev qesîdeyeke Şemsê Tebrîzî Xweda sir û razên wî pak bidêre, li ser Şahê Neqşebend Xweda sir û razên wî pak bidêre, gotiye. Teşeya helbestê xezel e û ji cureyên nezmê medîhe ye. Xezel bi Farsî ye û heft malik e. Di helbestê mexles û nav nehatiye diyarkirin. Ev medîhe di dîwana Şemsê Tebrîzî de cih nagire. Ji malika dawî nîveka risteya yekem nayê xwendin.

تا بیابم سر حق از لطف شاه نقشبند توتیائی دیده سازم خاک پای نقشبند
 Tûtiyâe dîde saz im xakîpayê Neqşibend Ta biyabim sîrrê Heq ez lutfî Şahi Neqşibend¹⁶
 ...

من کنم کحل الجواهر خاک پای نقشبند روشنا از ان سبب
rewşena ez an sebeb Men konem kuhlu'l-cewahir xakîpayê Neqşibend¹⁷

2.2.2.2 Helbesteke Hafîzê Şîrazî¹⁸

Sernavê helbestê weha ye: "Hafîz Şîrazî." Zimanê helbestê Farsî ye. Teşeya wê xezel e û duwazde malik e. Mîjar gazindeya ji rewşa dinê ye.

دردا که راز پنهان خواهد شد آشکارا دل می‌رود ز دستم صاحب‌دلان خدا را
 Dil mî rewed zi destem sahibdilan Xwuda ra Derda ki razi punhan xwahed şod aşkara¹⁹
 ...

ساقی بده بشارت رندان پارسا را خوبان پارسی‌گو، بخشندگان عمرند
 Xwûbani parisîgo beşendegani 'umrend Saqî bide bişaret rindani parsa ra²⁰

¹³ Di keşkûlê de xetayên rênivîsê dihên dîtin. Lewra "Çi tedbir en Musulmanim" bê wate ye. Herweha "yehûdî me" bi Kurdî ye. Farsiya wê "yehûdiyem" e. Dîsa "kibr" ne guncaw e ji bo malikê divê "gebr" be. Li gorî van tîbîniyan û li gorî her çar malperên di jênerota 16an de ev malik weha ye:

Çi tedbir ey musulmanan ki men xod ra nemîdanem
 Ne tersa û yehûdiyem ne gebr û ne musulmanem

(Hûn çî tedbîrê bo min divên gelî Muslumana, ez êdî xwe nas nakim. Ez ne rahîb im, ez ne yehûdî me, ez ne 'abîdê zerduştiya me û ne musulman im.)

¹⁴ Hişyar be ey Şemsê Tebrîzî! Tu di nava 'alemê de gotinên weke şekir rêz dikî. Çi ditirsî, çî ma dilerizî? Ma tu nizanî ku ez Xwedayê Rehman im?

¹⁵ Malika dawî ya keşkûlê di çavkaniyên navborî de derbas nabe.

¹⁶ Ezê axa bine nigê Şahê Neqşebend weke derman bixime çavên xwe hetanî ku ez ji lutfa Şahê Neqşebend sîrrên Xweda bi dest bixim.

¹⁷ Wateya risteya duyem: Ezê axa binê nigê Şahê Neqşebend ji xwere bikim weke kilê bi mucewher.

¹⁸ Yek ji navdartirîn şa'îrê edebiyata Farsî ye. Di sala 1326/1325 an de li Şîrazê hatiye dinê. Di sala 1390 an de li Şîrazê wefat dike. Ji wê dîwanek ma ye. (Xaliqî, 1381, r 1-25) Ev xezel di dîwana Hafîz de di rêza pêncem de cih digire. Di dîwanê de xezel 13 malik e. Di keşkûlê de malika dawî cih nagire. Bnr: (Yusifî, 1381, r 25).

¹⁹ Ey kesên 'arif û xwedî dil! Bo xatirê Xweda werin hawara min. Dilê min ji dest çûye û ya giring jî dike sir û razên min werin îfşakirin.

²⁰ Xweşikrûyên farsîziman canê mirov taze dîkin. Saqî! Mizgînê bigihîne rindên parsayî.

2.2.2.3 Helbesta Mewlana Nûreddîn ‘Ebdurrehman Camî

Ev helbest bi vî sernavî ye: "Hazîhî qesîdetun qale Mewlana Camî quddîse sirrûhû." Wate. Ev qesîde Mewlana Camî Xweda sir û razên wî pak bidêre gotiye. Ev helbest bi teşeya xezelê ye. Ji cureyên nezmê ne't e. Helbest heft malik e û zimanê wê Farsî ye. Ev helbest di dîwana Mewlana Camî²¹ de cih nagire. Lê di gelek malperan de hem bi nivîs û hem bi deng cih girtiye.²² Ev ne't ji teref ‘alim û şa‘irekî Kurd ve ku navê wî Emîr Xalidî Cildiyan e hatiye texmîskirin.²³

زمین از حلم او ساکن فلک از عشق او شیدا	و صلی الله علی نوری کزو شد نورها پیدا
We selallah ‘ela nûrî ki zi û şod nûriha peyda	Zemîn ez hilmi û sakin felek ez ‘işqi û şeyda ²⁴
...	
ژ معراجش خبر دارم که «سُبْحَانَ الَّذِي اسْرَى»	ژسرا سرءى (جامى) «ألم نَسْرَحْ» لبرخوندى
Ji sirra surreê (Camî) elem neşreh li ber xwondî	Ji mi'raceş xebardarem ki subhenel'lezî esra ²⁵

2.2.3 Helbestên Edebiyata Kurdî

2.2.3.1 Helbestên Feqîyê Teyran

1. Helbesta Feqîyê Teyran ya bi "Ji ‘işqa te ezê dîn im şev û rojê di xeyalê da" dest pê dike hatiye nivîsîn. Di dîwana Feqîyê Teyran de ev helbest 14 malik e. Di keşkûlê de ev helbest 15 malik e. Herweha di tertîba malikan û di bêjeyan de jî cudahî dihê dîtin.

Ji ‘işqa te ezê dîn im şev û rojê di xeyalê da,
Herroj carek te nabînim wekî gerham di malê da

...

Me sond xwarî bi Tahaê tu horîk î li dunyaê
Li mecnûnan were raê yeqîn bedr î di cemalê da

2. Helbesta Feqîyê Teyran ya bi navê "Ey av û av" dihê nasîn di vê rêzê de cih girtiye. Di keşkûlê de ev helbest bi tevahî 66 malik e. Di çapa wezaretê de ev helbest 46 malik e.²⁶ Li gorî

²¹ Nûreddîn ‘Ebdurrehman Camî, yek ji girîngtirîn şa‘ir, nazim û edîbê edebiyata Farsî ye. Di heman demê de mutesewifekî girîng e. Di sala 1414an da li navçeya Harcirdê girêdayî Cam a Xoresanê hatiye dinê. Di sala 1492an da li Heratê rehmet kiriye. Ji bilî dîwana wî gelek berhemên menzûm û pexşan li dû xwe hiştine. Heft Ewreng, Nefexatu'l-Uns, Lewaîh û Beharîstan ji hinek berhemên wî nin. Ji bo agahiyên berfireh bnr: (Herewî, 1377, r 31-35).

²² Bnr: <https://habibi-rasoolallah.blogfa.com/post/50> (Pêgihîn: 15.01.2025).

²³ Bnr: <https://sozimihrab.org/%D9%BE%DB%8E%D9%86%D8%AC-%D8%AE%D8%B4%D8%AA%DB%95%DA%A9%DB%8C%D9%84%DB%95%D8%B3%DB%95%D8%B1%D8%BA%DB%95%D8%B2%DB%95%D9%84%DB%8E%DA%A9%DB%8C%D9%85%DB%95%D9%88%D9%84%D8%A7%D9%86%D8%A7-%D8%AC%D8%A7/> (Pêgihîn: 15.01.2025).

²⁴ Silavê Xweda li ser nura te be ku hemû nûr ji wî peyda bûne. Zemîn ji helimtiya wî sakin û felek ji evîna wî dîwane ye.

²⁵ Ji sirra kêfxweşiya Camî, ayeta “Elem Neşreh” (ma me venekir) li ber xwend. Ji mi’raca te ez agahdar im lewra Xweda gotiye “Subhanellezî esra” (Wî Xwedayê ku ji hemû kêmasiya bêri ye bi şev).

²⁶ Bnr: (Feqîyê Teyran, 2014, r 37-44).

van amaran di keşkûlê de 20 malik zêdeyî çapa wezaretê ye. Herweha di rêzkirana malikan de û di hinek bêjeyan de cudahî dihê dîtin.

Ey av û av ey av û av	Ma tu bi ‘îşq û muhbet î
Mewc û pêla davê belav	Bê sekne û bê rahet î
...	
Barê emanet nas bikin	Ez xwar dibêm hûn rast bikin
Ji pirsra feqih xwe xilas bikin	Perîşan nebin li axretê

3. Ji bo vê helbestê sernavekî weha hatiye nivîsîn: "Haza qesîdetun "Dilo Rabe" qale Feqihê Teyran rehmetullahî ‘eleyhî." Wate: ev qesîdeya “Dilo Rabe” ye, Feqîyê Teyran gotiye. Ev helbest di çapa dîwana Feqîyê Teyran ya wezaretê de 82 malik e.²⁷ Di keşkûlê de ev helbest 79 malik e.

Dilo rabe dilo rabe veke çehvan ku êvar e
Nezano bes di xew da be bi newmê ra mebe yar e
...
Li Mîm û Hê gelek çû gelek sal û felek çû
Hezar û dû hem çil yek çû ev xezel hate diyar e.

4. Sernavê helbesta Feqiyê Teyran weha ye: "Hazîhî qesîdetun; min dî di xewnê da xulek.” Wate: ev qesîdeya “Min dî di Xewnêda Gulek” e. Ev qesîdeya Feqiyê Teyran di keşkûlê de û di çapa wezaretê de 5 bend e. Di rêza bendan de cudahî nehate dîtin, lê di rêza risteyên bendan de û di hinek bêjeyan de cudahî xuya dike. Hinek riste nayên xwendin.

Min dî di xewnê da gulek	Hişyar dibûm wê sa’etê
Nalîn ji min çûne felek	Sebr û qerara min netê
...	
Cumle eşya fena dibin	Ji keyfîyetê me’zûl dibin
Ji rengê berê tebdîl dibin	‘Aşîq bibinin xurbetê

5. 12 malik ji Helbesta Feqiyê Teyran ya bi malika "Ha hûn werin lazim werin cîran û xelqê hêşetê" dest pê dike hatiye nivîsîn. Ji ber ku ev helbest di çapên dîwanên Feqiyên Teyran de cih digire em li ser nesekinîn.²⁸

6. Ji helbesta Feqiyê Teyran ya bi malika "Ez çî bêjim çî beyan kim mexfiyata ez ‘eyan kim" dest pê dike heft malik hatine nivîsîn. Ji bo vê helbestê sernav nehatiye danîn.

7. Helbesta Feqiyê Teyran ya ku bi risteya "Bizan ku min yar tu yî" di vir de cih digire. Sernavê helbestê bi vî rengî ye: Feqeh Muhemmed Teyran: anku Feqî Muhemmedê Teyran. Hem di keşkûlê de û hem di çapa wezaretê de ev helbest 18 bend e. Di rêza risteyên bendan de cudahî dihê dîtin.

Bizan ku min yar tu yî

Dil ji ber birîndar tu yî

²⁷ Bnr: (Feqiyê Teyran, 2014, r 49-65).

²⁸ Bnr: (Feqiyê Teyran, 2014, r 45-48).

Ê kuştîme yek car tu yî	Pir li min kubar tu yî
Ê bi kumm û bi çar tu yî	Bi şeml û destar tu yî
...	
Nesaxê eşan ez im	Bi kull û derdan ez im
Mecrûh ji qehran ez im	Tazî yû 'uryan ez im
Ê dûr ji şehran ez im	Feqihê Teyran ez im

8. Ji bo vê helbestê sernavekî weha hatiye dayin: "Hazîhî qesîdetun Feqihê Teyran." Wate: ev qesîde ya Feqiyê Teyran e. Helbest hem xezel û hem jî tercî'î benedke murebbe' dikare were nivîsîn Lewra taybetiyên musememtê di xwe de digire. Mijar; fanîbûna dinê ye. Bi tevahî deh bend e. Ev helbest di dîwanên çapkirî yên Feqiyê Teyran de cih nagire.

Ela ey xafil û fanî	Li vî darî tu mihvanî
Hemîn axir tu poşmanî	Çi keyf û xwab û rahetî
...	
Bi ewlada nebe faxir	Ji bo mewtê bibe hazir
Li ser canê te be nazil	Çi keyf û xwab û rahetî

9. Ji bo vê helbestê ev sernav hatiye nivîsîn: "Feqihê Teyran." Ji xwe wate diyar e. Ev helbest jî weke ya jorîn hem bi teşeya xezelê û hem bi teşeya terkîbî benedke murebbe' jî dikare were nivîsîn. Helbest bi tevahî neh malik e. Helbest, ji cureyê nezmê mersiye ye.

Min ban kir Şahê Qudretê ev çî hewar li Mîm û Hê
 Qet kes bi banga min netê derdê xedar e l'Mîm û Hê
 ...
 Kan kubrayê çûna bi meş kan werd û reyhanê di reş
 Min dax û kovan mane keş rehmet bibare l'Mîm û Hê

2.2.3.2 Helbestên Mela Huseynê Bateyî

1. Sernavê helbestê weha hatiye nivîsîn: "Qesîdetun qîle 'ele'n-nebiyyil Muxtar we alîhi'l-exyar." Wate: qesîdeyê li ser pêxemberê bijartî û hevalên wî yên pir bi giramî hatiye gotin. Ev helbesta Bateyî di keşkûlê de 12 malik e.²⁹ Di dîwana Mela Huseynê Bateyî de ev helbest 14 malik e. Lê divê were gotin di navbera dîwana çapbûyî û keşkûlê de gelek cudahî dihê dîtin.

Kan me'dena sidq û sefa kanî 'eta cûd û sexa
 Behra keren kanî wefa kanî Muhemmed Mustefa
 ...
 Ger mumin in ger kafir in ger hakim û ekabir in
 Wellah hemî dê bimirin kanî Muhemmed Mustefa

2. Ev helbest bi vî sernavî ye: "Hazîhî qesîdetu qale Feqe Huseyn el-Ertûşî." Wate: ev qesîde ji teref Feqe Huseynê Ertûşî hatiye gotin. Di keşkûlê de helbest heft bend e. Di navbera keşkûlê û çapên dîwanê yên çapbûyî de ciyawaziyên biçûk dihên dîtin.

Ey ne'tê tu ez 'erşî heta ferşî şehîra

²⁹ (Sadîmî, 2013, r 134-136).

Ey ez pertewê nûra te cihan geşt munîra

...

Ey Seyyidê 'Alem senedê nûra hidayet

Hêvî dîkin em ji te ey sedrê rîsalet

2.2.3.3 Helbestên Şêx 'Ebdulqadirê Hezanî³⁰

1. Sernavê vê helbestê bi vî rengî ye: "Feqîr qîle 'ela Seyda et-Taxî." Wate: Feqîr li ser Seydayê Taxî³¹ gotiye. Teşe qesîde ye, cure mersiye ye. Di keşkûle de 11 malik e. Mexles nehatiye bikaranîn.³²

Eman Seyda eman Seyda min ne 'eql e min ne sewda

Çi derdek bû li min peyda te rihlet kir ji dunyaê

...

Feqîr im ez li dunyaê derman li derdê min naê

Di zar im ez û xew naê te rihlet kir ji dunyaê

2. Helbest bi vî sernavî ye: "Hazîhî qesîdetun qîle 'ela Şahi Taxî qedesellahû sirrehû." Wate: ev qesîde li ser Şahê Taxî hatiye gotin. Xweda sir û razên wî pak bidêre. Teşeya helbestê terci'î benda murebbe' e. Di keşkûlê de ev helbest heft bend e. Di nusxeya Doskî de helbest 24 bend e.³³

Pîrê me Şêxê Taxî ye
Heyf ku me agah jê niye

Wellahî mutleq fanî ye
Yareb derê feydê vekî

...

Dilşad û dildarê xwe kî
Terka wefadarî nekî

Şefqê bi azarê xwe kî
Yareb derê feydê vekî

3. Sernavê helbestê weha ye: "Hazîhî qesîdetun qîle 'ela eş-Şeyx 'Ebdurrehman et-Taxî quddîse sirrûhû." Wate: ev qesîde hatiye gotin li ser Şêx 'Ebdurrehmanê Taxî Xweda sir û razên wî pak bidêre. Helbest bi teşeya qesîdeya musemet e. Ji cureyên nezmê medihe ye. Qesîdeyeke dirêj e. Di nusxeya Doskî de 34 malik e.³⁴ Di keşkûlê de bes şeş malik ji vê helbestê cih girtiye.

Ez 'aşiq im dimînim heyrana Şêxê Taxî
Sergeşte û hezîn im sewdaê Şêxê Taxî

...

Nîn e ji qîsmê xasan derman dike qulûban
Safî dike 'uyûban kes mîslê Şêxê Taxî

³⁰ Şêx 'Ebdulqadirê Hezanî, lawê Mela 'Ebdullahê Hezanî yê Semerşêxî ye. Li cem bavê xwe dest bi xwendina medreseyê dike. Pêşî li ber destê Seyîd Sibxatullahê Erwasî dest bi perwerdehiya tesewufê dike. Paşê li cem Şêx Ebdurrehmanê Taxî seyr û siluka xwe didomîne û xelifetiya tesewufê ji wî werdigire. Di sala 28.6.1908 an de rehmet dike u li Hezanê ku gundekî navçeya Licê ye dihê veşartin. (Doskî, 2011, r 57-58.)

³¹ Seydayê Taxî, Şêx 'Ebdurrehmanê Taxî ye. Di sala 1831ê de li gundê Taxê ku girêdayê bi Bedlîsê ve ye hatiye dinê. Xelifeyê Seyyîd Sibxatullahê Erwasî (q.s.) ye. Di sala 1886 an de diçe ber dilovaniya Xwedê. Meqbera wî li Norşin e. (Tenik, 2015, r 125-126).

³² Ev helbest di berhema Doskî de 23 malik e. Bnr: (Doskî, 2011, 113-115).

³³ Bnr: (Doskî, 2011, r 96-100).

³⁴ Bnr: (Doskî, 2011, r 104-106).

4. Helbest bi vî sernavî ye: "Haza qesîdetun qale 'Ebdulqadir 'ela Xewsu'l-Hîzanî." Wate: ev qesîdeyeke 'Ebdulqadir li ser Xewsê Hîzanê gotiye. Helbest bi teşeya terci'î benda murebbe' hatiye nivîsîn û di keşkûlê de heyşt bend e. Ev helbest di berhema Tehsîn Doskî de 11 bend e.³⁵

Ela ey serwerê şahan	Tu dermanî li ser daxan
Ez im mecruh pirî efxan	Meded ya Xewsê Hîzanî
...	
'Ubeydulqadir û seyda	Kuleyb im dergehê Xeyda
Esîr im murşid î Seyda	Meded ya Xewsê Hîzanî

2.2.3.4 Helbestên Şêx 'Elaeddînê Xiznewî

1. Ev helbest bi vî sernavî ye: "We hazihî qale Şêx 'Elaeddîn Xiznewî." Wate: Ev e Şêx 'Elaeddînê Xiznewî³⁶ gotiye. Helbest 6 malik e, bi teşeya qit'eyê hatiye nivîsîn û mijara wê xwe biçûk dîtin e, xasma li hember kesayetên tesewufî.³⁷ Malika yekem:

Ne ez şêx im ne ez qutb im ne ez xews û ne ez murşid
Welakîn ez şivanê Hedret û Şahê li Xizna me
...
Ne ez hakim ne ez sultan ne ez mîr û ne wezîr im
Welakîn ez xulamê Hedret û Şahê li Xizna me

2. Sernavê helbestê weha ye: "Hazihî qesîdetun qale Şêx 'Elaeddîn el-Xiznewî." Wate: Ev qesîde Şêx 'Elaeddînê Xiznewî gotiye. Helbest bi teşeya xwe Qit'e ye, mijar evîna murşidî ye û sê malik e.

Bi mengena min hûr bikin nava dilê min şeq bikin
Top û tiving lê rast bikin terka te nadim çavxezal
...
Ya Reb 'Elaeddînê jar xemrî vexwar ew çendî car
Êdî mirin her bête xwar bê feyde ye ev qîl û qal

3. Sernavê helbestê weha ye: "Hazihî Qesîdetun qale Şêx 'Ela bn. Şeyx Ehmed el-Xiznewî." Wate: ev qesîde ji teref Şêx 'Elayê kurê Şêx Ehmedê Xiznewî ve hatiye gotin. Helbestek dirêj e ku ji 32 malikan pêk hatiye.³⁸ Teşeya helbestê xezel e. Şa'ir navê xwe di malika 26 an de diyar dike.

Em zelîl in em feqîr in, ya Resûlallah meded

³⁵ Bnr: (Doskî, 2011, r 101-13).

³⁶ Şêx 'Elaeddînê Xiznewî di sala 1919 an de li Sûrî li gundê Xizna ku girêdayê bi Qamişlo ve ye hatiye dinê. Xelifetiya terîqetê ji bavê xwe Şêx Ehmedê Xizna (1887/1950) wergirtiye. Di sala 1969 an de li Şamê rehmêt dike. Li gundê Tilme'rûf dihê veşartin. (Aktan, 2019, r 3-15)

³⁷ Ev helbest di Dîwanen Camîe'n de 7 malik e û tertîba wê cuda ye. Bnr: (Şeyxmûs, 2014, r 118). Di teza navborî ya di jêrenota 36an de ev helbest sê malik e. Bnr: (Aktan, 2019, r 39-40).

³⁸ Ev helbest di keşkûla Qoxî de 34 û di keşkûla Mela Şeyxmûs de 35 malik e. Bnr: (Qoxî, 2022, r 35; Şeyxmûs, 2014, r 22).

Em esîr in purr heqîr in, ya Hebîbellah meded

...

Me yeqîn kir tevî ‘eyban vî dexîlî ne kî şerman

Xatirê wan çav û ‘eynan ya Resûlellah meded

2.2.3.5 Helbestên Mela Ehmedê Heyderî³⁹

1. Mela Nezîr ji bo vê helbestê du sernav daniye. Pêşî nivîsîye: "Welehû Eyden," yanî ev helbest jî ya Şeyx ‘Ebdulhekîm el-Huseynî ye. Li ser vî sernavî xêzek kişandiye û li binî weha nivîsîye: "Feqîle Mela Heyderî." Wate: Hatîye gotin ku ev helbest ya Mela Heyderî ye. Helbest bi teşeya xezelê, bi neh malikan hatiye nivîsîn û cureya wê medîhe ye.

Li dergahê te Qitmîr im ela ya dawerê Xizna

Çi Qitmîr belkî yexsîr im dexîl im rihberê Xizna

...

Eya mehbûb eya zeynî mînel eynî îlel eynî

‘Ela ‘eynî ‘ela resî xuyabû serwerê Xizna

2. Sernavê helbestê bi vî rengî ye: "Hazîhî qesîdetun qîle ‘ela Şahê Xiznewî quddîse sîrrûhû."

Wate: ev qesîde li ser Şahê Xizna hatiye gotin. Helbest bi teşeya qesîdeyêke musemmet hatiye nivîsîn. Ji cureyên edebî medîhe ye. Di keşkûlê de 8 malik e. Ev qesîdeya şêx Ehmedê Heyderî 14 malik e. Paşê lawê wî Şêx Muhemmed Emînê Heyderî 3 malik lê zede kiriye û xistiye nav dîwana xwe.⁴⁰ Ev qesîde di heman demê de bi deng jî di malperan de cih digire.⁴¹

Ellah nîgehdarê te bî ey tacîdarê Xiznewî

Perwerdîgar yarê te bî ey şehsuwarê Xiznewî

...

Ev nam û denge bê riya ‘ilm û terîqa sofîya

Behrek ji Norşîna Diya hat çû kenarê Xiznewî

2.2.3.6 Helbestên Şêx ‘Ebdulhekîmê Qesrewî el-Huseynî⁴²

1. Sernavê qesîdeyê ev e: "Hazîhî qesîdetun qale eş-Şeyx ‘Ebdulhekîm el-Huseynî ‘ela eş-Şeyx Ehmed el-Xiznewî quddîse sîrrûhû. Wate: ev qesîdeyêke Şêx Seyyid ‘Ebdulhekîm li ser Şêx Ehmedê Xiznewî gotiye. Bi teşeyek cuda hatiye nivîsîn. Belkî em navê sêpareyê lê bikin ewê di cih de be. Ji cureyên nezmê medîhe ye û heyşt bend e.

‘Elemdarî di ‘esrê da heya sultanê ‘uşşaqan Dîkin fexrê di dewrê da xiyasa mustexîsînan

Yeqîn bedrî di ‘alem da ebû Me’sûm şehê şahan

...

³⁹ Mela Ehmedê Heyderî di sala 1887 an de li Dedeliyê (Dadalu, Dedelî, Dardevî, Dardarlu) ku dikeve navbera Ercîş û Patnosê hatiye dinê. 1937an de li gundê Bawernê ku girêdayê Nisîbênê ye rehmê dîke. (Beyter, 2013, r 16-27).

⁴⁰ Ji bo agahiyên zêde û metnê qesîdeyê bnr: (Beyter, 2013, r 17-19)

⁴¹ https://www.youtube.com/watch?v=OaN6I2AJq8E&ab_channel=Kasidehane. (Pêgîhîn:08.01.2025)

⁴² Şêx ‘Ebdulhekîmê Qesrewî el-Huseynî, di sala 1905 an de li gundê Bilwanis ku girêdayê Hawêla Sêrtê ye hatiye dinê. Xelîfeyê Şêx Ehmedê Xiznewî ye. Di sala 1972 an de rehmê dîke û li gundê Menzîlê dihê veşartin. (Taşkesen, 2007, r 13-25).

دریایی وصفها باشد ژ قافان تا بقافا تا
مانند تو نشان نهد دیدهای کامالاتا
سگی کمتر عین ومیم بت بر عتب تازه گل یکتا
Deryayi wesfeha başed ji qafan ta bi qafa ta Manendi tû nişan nedhed dîdehaê kemalata
Segê kemter ‘Eyn û Mîm bit ber ‘utbê taze gul yekta⁴³

2. Helbest bi vî sernavî ye: "Welehû Eyden Quddîse Sîrrûhû." Wate: Dîsa wî gotiye Xweda sir û razên wî pak bidêre. Helbest bi teşeya mesnewî hatiye nivîsîn û mijar medîhe ye. Bi tevahî heyşt malik e.

Mehbûb û şîrîn şah î Suleyman î di dewrê da
Xurşîd û we hem mah î gulzar î di rewdê da

...

Di cûdê da keremkar î hemîşe sani‘ê lewh î
Bi başed nîge û yarî ber bala sûretê fethî

3. Helbest bi vî sernavî ye: "Welehû Eyden Quddîse Sîrrûhû." Wate: Dîsa wî gotiye Xweda sir û razên wî pak bidêre. Teşeya helbestê xezel e û mijar medîhe ye. Helbest ji heyşt malikan pêkhati ye.

Ey gulşenê baxê wîsal dilawîz û xunce qeda
Re’na û nûrîn ta bi ser şîrîn û nazik xweş seda

...

Lutfê bike şehê şahan ber î segê kemter ‘eyan
Rûreş û bêçare çunan name siyah kirye geda

4. Helbest bi vî sernavî ye: "Welehû Eyden quddîse sîrrûhû." Wate: Dîsa wî gotiye Xweda sir û razên wî pak bidêre. Helbest bi teşeya xezelê ye, mijar medîhe ye û bi tevahî 12 malik e.

Afîtaba rûyê dunya mîr û şahê Xiznewî
Rûh û can cumle fida bin padişahê Xiznewî

...

‘Ebd û kole ê Wehîd î rûsiya ‘Ebdulhekîm
Bêm nigah Mewla zehîr î padişahê Xiznewî

5. Helbest bi vî sernavî ye: "Welehû Eyden quddîse sîrrûhû." Wate: Dîsa wî gotiye Xweda sir û razên wî pak bidêre. Teşeya nezmê terkebî benda muxemmes e. Medîheyek e di derbarê Şahê Xizna de. Helbest pênc bend e.

Ez nizanîm Mihdî ye yan Yûsîfê sahib cemal
‘Îsaê derd û birîna hikmeta Luqman li bal
Dê çikim ez mal û dewlet min nevê dunya û mal
Çaregahê min li Xizna hedretê Seyyid Kulal
La ezal û fî hewakum mislî mecnûnê cîbal

ومن الاحفاد طراً صانه المولى المجيد
ملجه ئى اسلامى نينه غيرى ته قطبى فرید

زاده الله بقاك بيننا طول المديد
انك للدين حسناً كل يوم في المزيد

⁴³ Ji çiyayê Qaf hetanî çiyayê Qaf bibin deryayê pesnên te. Kes weke te nedikare çavê mirovî veke ji bo kemalatan. Segê kêmîr ‘Eyn û Mîm be li ser nîgekî bimeşe li pey wê gula taze û yekta.

...

Ey nûn û zal û yê û ra gazî bike tu eşkera
Sultanê dîn bû zahir e nisbet bela kir li her derî

3. Helbest bi vî sernavî ye: Haza Qesîdetun Qale Muhemmed Nezîr el-Feqîr ‘Ela Şeyxîhî eş-Şeyx Muhemmed Raşid es-Serwerî. Wate: Muhemmed Nezîrê jar li ser şêx û serwerê xwe Şêx Muhemmed Raşid gotiye. Helbest terkîbeke museddese. Ji cureyên nezmê medîhe ye. Ev terkîb ji heyşt bendan pêk hatiye.

Em hemdê Xweda kin her ew ku mû’în e
Murşid ji me ra da sultanê zemîn e
Nasir ew e îro bo dînê mûbîn e
Şewket ji te ra tim hukmê te bimîne
Hubba te li dil da lew dil dihejîne
Zanim di zemanê me bi mislê te tunîne

...

Ev Nûn û Zalê bedbextê siyah rû
Bê can û dil ma jê ra ku nema rû
Ya Reb tu kerîm î ‘eybê me me de rû
Lutfê li me ke hem ‘efwê xwe bide rû
Ev Nûn we Zalî halê wî tunîne
Zanim di zemanê me bi mislê te tunîne

4. Sernavê helbestê ev e: "Eyden quddîse sirrûhû." Wate: dîsa Xweda sir û razên wî pak bidêre. Ji naveroka helbestê em fehm dikin ku helbest di derbarê Şêx Muhemmed Raşid de ye. Bi teşeya terci’î benda museddese û çar bend e. Mîjar ‘îşq û evîna murşidî ye. Helbest di keşkûlê de bê mexles e.

Em hemdê Xwedakin her ew ku mû’în e
Murşid ji me ra da sultan ji bo dîn e
Nasir ew e îro bû li dînê mûbîn e
Şewket ji te ra hukmê te bimîn e
Serwer û rehber her ew e sultan ji bo dîn e
Zanim di zemanê me bi mislê te tunî ne

...

Sultanê zeman î wek te me nedî ne
Nesla te temîz e tev qutb û welî ne
Xesma ku li pişta te ew Xewsê Şîrîn e
Seyda û Hedret mala Xiznewî ne
Serwer û rehber her ew e sultan ji bo dîn e
Zanim di zemanê me bi mislê te tunî ne

5. Sernavê helbestê weha ye: "Hazîhî qesîdetun qale Muhemmed Nezîr ‘ela şeyxîhî Muhemmed Raşid quddîse sirrûhû." Anko: ev qesîde Muhemmed Nezîr, li ser şêxê xwe

Muhemmed Raşid gotiye. Ji teşeyên nezmê terkîbî benda muxemmes e. Ji cureyên nezmê medîhe ye. Helbest pênc bend e. Di dawiyê de nav û mexlesa helbestvanî nehatiye diyarkirin.

Ey gelî dost û bira rabin herin bi ‘ird û ‘iyal
Herne derga şahê Menzîl sahîbe husn û cemal
Pê munewwer dê bibin hûn mislê bedra pur kemal
Qelb û dil mesrur bitin ew ji nezera wî çavxezal
Hey hewar e Şahê Menzîl murşide bê qîl û qal

...

Xestehal im nexwoş im ey Şahê Menzîl el meded
Hêvîdar im tu dewakî qelb û ehşâ û kebed
Tu hekîm î mislê Lukman dawiyê cism û cesed
Her bi te îro şîfa bûn bê hîsab û bê ‘eded
Her tu wî sultanê dîn îro bi şahid û sened

6. Sernavê helbestê bi vî rengî ye: "Qale Mela Muhemmed Nezîr fî mersiyeti'l-Xews quddîse sirrûhû. Wate: Mela Muhemmed Nezîr di mersiyeya Xews⁴⁷ de Xweda sir û razên wî pak bidêre dibêje. Teşeya helbestê xezel e. Ji cureyên nezmê mersiye û malika dawî maddeya tarîxê ye. Ziman ‘Erebî ye û 6 malik e.

وَأَمْطِرُ مِنْ سَحَابِكَ الدَّمْعَ وَقَلِّ	أَلَا يَا عَيْنِي أَبْكِي وَلَا تَهْمُلُ
يَوْمَ الْخَمِيسِ فِي (عُشِّ صُنْبٍ) يَكْمُلُ	فَقَدْ صَعَدَ إِلَى حَضِيرَةِ قُدْسِكَ الْيَوْمَ
Ela ya ‘eynî ebkî wela tehmul	We emtir min sehabeke’d-dem‘û we qul ⁴⁸
Qed se‘ede îla hedîretî qudsîke’l-yewm	Yewme’l-xemîsî fî (xuşşe subbe) ⁴⁹ yekmul ⁵⁰

7. Ev menzûmeya Mela Nezîr di derbarê serpehatiya Eba Yezîdê Bestamî û Rahibên Dêrê de ye. Sernavê menzûmeyê weha ye: "Haza nezmun ‘ela zîhabî Eba Yezîdu’l-Bestamî îla dêrî Sem’an⁵¹ we Îslamî ma fîhîm mînel qesîsî we’r-ruhban." Wate: ev nezmeke li ser çûna Eba Yezîdê Bestamî bi bal dêra filehan û Muslumanbûna keşe û rahiben di dêrê de. Di binê sernavî de bi ‘Erebî besmele hatiye nivîsin. Weke ku ji sernavê menzûmeyê jî xwuya dike ev serpehatiyek e. Bi teşeya mesnewîyê hatiye nivîsîn. Bi tevahî 166 malik e. Di dawîya menzûmeyê de ev nîşe hatiye dayin: Temmet Mebhesu’s-sualî minel Bestamî Wel Cewabî min Terefîhî Quddîse Sirrûhû Neqeltu Mînel Mecceletî we keza Reeyte Hîkayetehû fî Kutûbihî. Wate: behsa pirs û bersîvên Bestamî Xweda sirr û razên wî pak bidêre bi dawî bû. Min ji

⁴⁷ Mebest ji Xews; Şêx ‘Ebdulhekîmê Qesrewî el-Huseynî ye.

⁴⁸ Ey cavên min bê muhlet bigrîn, weke baranê hêstiran bibarîn û bibêj.

⁴⁹ Mela Nezîr li bîhê van peyvan reqema 1392 daniye. Ev bi hesabê ebcedê derxistina reqaman ji bêjeyên; Xuşşe Subbe ye. 1392 dihe beranberê 1972. Yanî wefata Şêx ‘Ebdulhekîmê Qesrewî el-Huseynî nîşan dide.

⁵⁰ Îroke roja pêşemê ye, dema ku şefeq bi tevahî derket hêja ewê bigihêje meqamê we yê bilind.

⁵¹ Dêra Sem’an an bi navekî din Deyrsem’an navê deverekê ye ku nêzî Humusa Sûrî ye. Navê kinîseyê ve deverê Dêra Sem’an e. Li ve deverê ‘Umerê kurê ‘Ebdul‘ezîz hatiye veşartin. Herweha li çiyayê Lubnanê dêreke din bi vî navî heye ku navê xwe ji yekî mezinên ‘Îsewîyan wergirtiye (Dihxwuda, 1377, r 11385).

rojnameyê neqil kir çewa ku min ev hîkaye di kitêbên wî de jî dîtiye. Ji vê nîşeyê diyar e ku ev menzûme ya Mela Nezîr e.

Ezê ji we ra bejîm ‘ecîbek giran e Guhê xwe bidin min ey gelî bira ne
 ...
 Zunnar te girêda ji bo xatirê me Me pencsed hep qetandî ji bo xatirê te

2.2.3.8 Helbestên Mela Qasim⁵²

1. Sernavê helbestê; "Welehû eyden e." Yanî; dîsa ew dibêje. Helbest heft bend e û bi teşeya terkîbî benda murebbe’ hatiye hûnandin. Cureyê helbestê medîhe ye.

Barî li me kir şefqet e Nuqtek ji behra rehmet e
 Da me ji bona Nusret e Lîllah şukur ew bû nesîb
 ...
 Pêxember her cedde wî ye Qasim bi xwo kolê wî ye
 Mehbûs di zindana wî ye Lîllah şukur ew bû nesîb

2. Sernavê helbestê; "Welehû eyden e." Yanî; dîsa ew dibêje. Teşeya helbestê terkîbî benda murebbe’ e, cureyê helbestê medîhe ye û hejmara bendan neh e. Taybetiya helbestê ev e ku malika wasiteyê bi ‘Erebî ye. Ev yek helbestê dike mulemme’eke tekûz.

Min di baxê gul şêrîna sorgulek bûye hebîb
 Şakir im ez ya Îlahî ew ji bom in bû nesîb
 Ez ji ‘işqa wî birîndar im hezîn im dil keîb
 Tecrî minhû feyd û nisbet herwekî main mû’în
 ...
 Ey gelî ixwanê sadiq hûn nekin lewmê tucar
 Çûme ser hewda se’adet cur’eyek av min vexwar
 Berq û tîrê wî li dilda qelb û ciger anî xwar
 Tecrî minhû feyd û nisbet herwekî main mû’în

2.2.3.9 Helbesta ‘Ebdulxenî

Ev helbest bi vî sernavî ye: I’lem Ænne Hazihî qewlu’l-qîmetî Lî ‘Ebdulxenî, Ketebtû Min Hifzî Fela Tûbalî Fî Tertîbihî. Wate: Bizanibe ev gotinên bi qîmet yê ‘Ebdulxenî ne. Li gorî tiştê di hişê min de maye min nivîsî. Min guh nedaye tertîba wê. Bi teşeya musemmetê hatiye nivîsîn. Mijar tewbe û poşmaniye. Weke Tobenameyekê dikare were hesibandin. Bi tevahî 16 malik e.

53

‘Eyn û bê û dal û lam xeyn û nûn û ya û tam
 Rabe bike tewba dewam Estexfirullahel‘ezîm

⁵² Mela Qasim, birazyê Mela Nezîr e. Di sala 1945 an de li Hergemo hatiye dinê. Li çend gundan melatî kiriye. Vêga teqawut bûye û li Qozlîxê malnîşîn e. (Mela Qasim Akin, Mela-Malnîşîn, Hevpeyvîn, Qozlîx, 07.01.2025).

⁵³ Navê ‘Ebdulxenî di çend çavkaniyan de derbas bibe jî derbarê jîyan û kesayeta wî de agahî nayên dayin. Di berhema Baxê Îrem de çar malikên vê helbestê hatine dayin. Bnr: (Dokî, 2020, r 94). Di Keşkûla Kurmancî ya Celîlê Celîl de 12 malikê vê helbestê hatine dayin. Bnr: (Celîl, 2004, r 127-128).

...

Eger te cewab neda şedîd dê li te bidin derbê hedîd
Şolan dikin bi emrê Mecîd Estexfîrullahel‘ezîm

2.2.3.10 Helbesta Mela ‘Ebdullahê Kotalî

Di sernavê helbestê de weha hatiye nivîsîn: "I'lem îinne hazihî Qesîdetun qale Mela ‘Ebdullah fi mersiyetî eş-Şeyx Xalid İbnî eş-Şeyx ‘Elauddîn el-Oxînî." Wate: Bizanibin ev qesîde Mela ‘Ebdullah di mersiyeya Şêx Xalidê kurê Şêx ‘Elaeddînê Oxînî de gotiye. Ji teşeyên nezmê qesîde û ji cureyên nezmê mersiye ye. Di keşkûlê de 17 malik e.⁵⁴

Perîşan im sebir naê ji baê firqeta daê
Hemî zatê di zanaê çewa çûn alê ‘uqbaê

...

Bî îxlasî bike zarî ji Mewla Xaliqê Barî
Nebî mehrûm ji enwarî di dunyaê di ‘uqbaê

2.2.3.11 Helbesta Hesênê Êstirî⁵⁵

Sernavê helbestê bi vî rengî ye: "Qesîdetun qale Hesên Êstirî ‘ela Şahi’l-Xiznewî quddîse sirrûhû." Wate: Qesîdeyê Hesênê Êstirî li ser Şahê Xizna gotiye Xweda sir û razên wî pak bidêre. Ji teşeyên nezmê terci’î benda muxemmes e. Ji cureyên nezmê medîhe ye. Helbest bi tevahî 7 bend e. Derbarê Hesênê Êstirî de me tu agahî peyda nekir. Helbestvan di benda dawî de mexlesa xwe û navê gundê xwe tîne ziman.

Ehmedê Mihdî li Xizna bê nezîrî fîzzeman
Feyd û nisbet tev reşandin sahibê himmet giran
Tu ji bo me pişt û ‘ewnî sed hewar û sed fîxan
Hêvîdar in em ji te ey padişahê eqlîman
Seyyidê min serwerê min Şahê Xizna el eman

...

Pîrs bike carek li me pîrs û îhsan şe-nê te ye
Pur gunehkar e feqîr e kelbê dergahê te ye
Nezerek awur mubarek berde ser qelbê me ye
Ha û Sîn û Nûn ji Êstir rûreş û bê melce ye
Seyyidê min serwerê min Şahê Xizna el eman

2.2.3.12 Helbesta Mela ‘Ebdulhemîd

Sernavê helbestê ev e: "Qesîdetun qîle ‘ela Hedret." Wate. Qesîdeyê hatiye gotin li ser Hedret. Ji teşeyên nezmê terkîbî benda murebbe’ e. Ji cureyên nezmê mersiye ye. Herweha

⁵⁴ Ji bo jîyan û helbestên mela ‘Ebdullahê Kotalî bnr: (Sönmez, 2018, r 84-102). Di vê gotarê de ev helbest 21 malik e.

⁵⁵ Ev helbest di keşkûla Mela Şeyxmûs de bi hinik cudahî cih digire. Hejmarên benda weke hev in. Di rêzkirina misrayan û di hinek peyvan de ciyawazî dihê dftin. Ciyawaziya girîng ev e ku di benda dawî de navê Êstil derbas dibe. Weke tê zanîn Êstil Mîdyad e. Bi gumana me helbestvan ji Êstilê ye. Bnr: (Şeyxmûs, 2014, r 97-99).

mulemme'eke duzimanî ya netekûz e. Şa'ir di hinek benda 'Erebî bi kar anîye. Helbestvan di benda dawî de herfên sere navê xwe weke mexles bi cih kiriye. Bi tevahî 16 bend e.⁵⁶ Di derbarê nivîskarî de me tu agahî peyda nekir.

هالني بعدالفراقي كم زمانٍ غربةً

Wehşeta min firqeta min xurbeta min el meded

...

Eyn û bê dal lam û ha û mîm û ya û dal

Hesbeten lîllah nebînîm qet ji dergahê delal

ايها الاخوان ديناً انظروني رحمةً

كل من صادفه في الأمر نال غايَةً⁵⁷

ماوشوقاً قال فيه شرح متن عرض حال⁵⁸

Serwerê min rehberê min Şahê Norşîn el meded

2.2.3.13 Helbesta Şêx Me'sûm

Sernavê helbestê: Weha ye. "Hazîhî qesîdetun qale eş-Şeyx Me'sûm 'ela..." Wate: Ev qesîde Şêx me'sûm gotiye li ser... Ji ber ku dawîya hevokê nayê xwendin em nizanin ev helbest li ser kê ye. Di heman demê de em nizanin ku Şêx Me'sûm jî; Şêx Me'sûmê Erwasî ye, Şêx Me'sûmê Oxînî ye an Şêx Me'sûmê Xiznewî ye. Helbest bi teşeya Qit'eyê hatiye nivîsîn. Mijar alîkarî xwestin ji murşidî ye û 12 malik e.

Ya 'alî meqamatî wek pîrê xerabatî

Her an û we ewqatî derman ke dilêm carek

...

Tu bîne li dîwanê camek ji meyxañê

Qurbana te reyhanî 'aşîq ke dilêm carek

2.2.3.14 Helbesta Mela 'Ebdulfettahê Hezroyî⁵⁹

Sernavê helbestê weha hatiye nivîsandin: "Hazîhî qesîdetun qale el-Mela Fetah Hezroyî 'ela Hedret quddîse sirrûhû." Wate: Ev qesîde Mela Fetahê Hezroyî li ser li ser Hedret Xweda sir û razên wî pîroz bidêre gotiye. Helbest bi teşeya qesîdeyê hatiye hûnandin. Hejmara malîkên qesîdeyê 24 e.

Ya Reb çî ev seda bû li 'alemê mîsalî,

'Alem ji ber fena bû şah û wezîr û walî

...

Fethî eger bimîred ber xaki asîtaneş

Qed sar eza heyatî kanet bila zewalî

⁵⁶ Ev helbest di keşkûla Mela Şeyxmûs de 13 bend e û benda mexlesê cih negirtiye. Bnr: (Şeyxmûs, 2014, r 73-76).

⁵⁷ Wateya her sê risteyên 'Erebî: Ey birayên min yê Musliman, bi çavê rehmê li min mêzekin. Piştî firaqê ez westiyam, çendî zeman derbas bû li xurbetê. Her kesê ku di vê rêyê de rastî wî were ew digihêje armancê.

⁵⁸ Ji bo arezûya we min di vir de şerha halê xwe weke erzîhal anî ziman.

⁵⁹ Mela 'Ebdulfetahê Hezroyî di sala 1292 an de li Hezroyê hatiye dinê. Di sala 1975an de li Hezroyê rehmê kiriye. (Ertekin, 2016, r 80).

2.2.3.15 Helbesta Mela ‘Ebdullah

Sernavê helbestê; "Welehû eyden e." Yanî; dîsa ew dibêje. Ji naverokê xuya ye ku şa‘ir ev helbest derbarê Şeyx Seyyid Muhammed Raşid el-Huseynî de hûnaye. Bi teşeya tercî‘î benda murebbe’ e. Mijar daxwaza alîkarîyê ji murşidî ye. Bi tevahî 17 bend e. Şa‘ir navê xwe di malika berya malika dawî de aniye ziman. Di derbarê Mela ‘Ebdullah de me tu agahî bi dest nexist.

Sultan li min rehmê bike	Cirhê li min dewa bike
Qelbê li min safî bike	Ez ketme bextê merqedê
...	
Hûn bi qedrê Xweda bikin	Bi heqqê van dosta bikin
Ji bo me ra dû‘a bikin	Ez ketme bextê merqedê

2.2.3.16 Helbesta Mela Mehemed Emîn

Sernavê helbestê; "Welehû eyden e." Yanî; dîsa ew dibêje. Ji teşeyen nezmê weke tercî‘î benda muxemmes dikare were hesabandin. Ji naveroka wê bi zelalî diyar e ku medfîheyeke li ser Seyyid Muhammed Raşid el-Huseynî û 16 bend e. Derbarê şa‘ir de me tu agahî bi dest nexist.

ادخلتنا دورا راشد	حمداً لك يا ربنا
كن حافظاً له واحد	اعطيته حلم الحكيم
حمد و ثنا و صد شكر ⁶⁰	

...	
Îsmê di min Muhammed Emîn	Can û dilê min tev birin
Zarîn dikim ji qelbê hezîn	Hêvîm ricam sultanê dîn
Hemd û sena û sed şukur	

2.2.3.17 Helbesta Mela Xelîl

Sernavê vê helbestê bi vî rengî ye: "Qale Mela Xelîl el-..." Wate: Mela Xelîlê gotiye. Ji teşeyên nezmê terkîbî benedê murebbe’ e. Ji 10 benda pêk hatiye. Ji cureyên nezmê şîkayetname-gazindenname ye. Di helbestê de nav û mexles derbas nabe. Derbarî şa‘irî de em ne gihaştin tu agahiyan.

Van zalima zulme pêla	Bi zincîr û serê têla
Hudûd girtin ji her kêla	Nehîştên ti terîq û rê
...	
Gerandin şêwr û bertîla	Li ser kursîna funtîla
Bi siyaset fen û hîla	Li hev tevda dikin ew rê

2.2.3.18 Helbesta Mela Ni‘metullah

Sernavê vê helbestê weha hatiye dayin: "Qale Mela Ni‘metullah fi’s-selatî ‘ele’n-Nebiyî sellellahû ‘aleyhî wesellem." Wate Mela Ni‘metullah di derbarê Selewatên ser Pêxember de,

⁶⁰ Hemd ji te re be ya Rebbê me! Te em daxilî dewra Raşid kirin. Te helîmbûna hekîm diyarî wî kir. Xwedayê ku yek e wî diparêze. Hemd û sena û sed şikir.

selat û silavê Xweda lê bin, gotiye. Ev helbest bi teşeya terci'î bendeke murebbe' hatiye nivîsîn û bi tevahî heft bend e. Weke Selewatname dikare bikeve nava cureyên edebî. Di derbarê Mela Ni'metullah de me tu agahî bi dest nexist.

Ger bende Xwuda î	Wer zende dil kucaî
Der dînê Mustefa î	Selewat ber Mûhemmed
...	
Ger te divê ni'metullah	Bixwûne navê Ellah
Ji remza Qulhuwella	Selewat ber Mûhemmed

2.2.3.19 Helbesta Mela Nûrullahê Godîşkî

Sernavê helbestê weha ye: "Qesîdetun 'ela Medînetu'n-nebî." Wate: qesîdeyek li ser Medîneya Pêxemberê Xweda. Helbest bi teşeya xezelê hatiye nivîsîn. Ji cureyên edebî medîhe ye. Di keşkûlê de neh malik e. Ev helbest di dîwana Mela Nûrullahê Godîşkî de bi sernava "Ya Resulellah" hatiye nivîsîn. Helbest bi tevahî 14 malik e.⁶¹ Di keşkûlê de malika yekem û ya dawî bi vî rengî ye.

Medîne xweş medîne barekella Resûlellah
 Hezar zozan bibin qurban ji ber tirba Resûlellah
 ...
 Bi awur ta mescida 'alî dikit tebdîli ehwalî
 Eger qenc î eger xal î ji ber nûra Resûlellah

2.2.3.20 Helbesta Îskenderê Bilwanîsî

Sernavê helbestê weha ye: "Hazîhî qesîdetun qale Îskender el-Bilwanîsî kema semî'tû." Wate: ev qesîde ye Îskenderê Bilwanîsî⁶² gotiye çewa ku min guhdarî kiriye. Ev helbest bi teşeya terci'î benda murebbe' hatiye nivîsîn. Şeş bend e û weke Şîkayetname-Gazindenameyek ji rewşa dînê dikare were hesibandin. Di helbestê de nav û nişana şa'irî neh hatiye diyarkirin. Pêkane ku ev helbest ne tamam be. Di derbarê Îskenderê Bilwanîsî de me tu agahî bi dest nexist.

Ey Xaliqê Heyy û Cebar	Ji pêxember û welyê kubar
Çûne erdê bûne star	Hemd û sena ji navê te ra
...	
Ew nizanin mezhep çi ye	Dibên dunya ebedî ye
Heta ku rabit Mehdi ye	Hemd û sena ji navê te ra

⁶¹ Bnr: (Sönmez, 2023, r 29-30).

⁶² Ev helbest di Dîwana Camî' de di binê navê "Îskenderê Bilwanî" hatiye nivîsîn. Di vê berhemê de ev helbest heft bend e. Bnr: (Qoxî, 2022, r 444).

2.2.3.21 Helbesta Seyyid Sibxetullahê Erwasî

Ji bo vê helbestê ev sernav hatiye danîn: "Hazîhî qesîdetun qale Xewsu'l-Hîzanî quddîse sirrûhû." Wate; ev qesîda hane Xewsê Hîzanê⁶³ gotiye Xweda sirr û razên wî pak bidêre. Helbest bi teşeya xezela musemmet hatiye nivîsîn û 12 malik e. Di helbestê de nav û mexles nahetî ye nivîsîn.

Hemd û sena ji bo wî emê bibin tûrab e
Mîn qebra teng û tarî razên heta hîsab e

...

Ez 'ebdekî de'îf im rica dikim cewab e
Racî lutfâ Letîf im weqta qasid beyan be

2.2.3.22 Helbesta Şêx Mehmûdê 'Erbowî⁶⁴

Sernavê helbestê weha ye: "Hazîhî qesîdetun qîle 'ela Xewsu'l-Geylanî quddîse sirrûhû." Wate: ev qesîde li ser Xewsê Geylanî⁶⁵ hatiye gotin. Ev helbest bi şeweya muselles hatiye nivîsîn û ji cureyên nezmê medîhe ye. Bi tevahî 11 bend e.

Hem hebîb î hem tebîb î Xewsê Geylanî meded
Rûh û canê min fîda bî min bi wî Rebbê Ehed
Der terîqet der heqîqet her ewe wahid û ferd

...

Mîm û Ha û Mîm û wa Dal ma dibin barê guna
Tu Şefî'e wî be l cem Heq hem li cem cedde wî ya
Da ku ew şermî nebîtin der huzura Lem Yûled

2.2.3.23 Helbesta Derwêş Mehmûd⁶⁶

Sernavê helbestê weha ye: "Hazîhî qesîdetun qîle 'ele'n-Nebî Sellellahû 'Eleyhî Wesellem qîle..." Wate: ev qesîdeyê hatiye gotin li ser Pêxember silavê Xweda li ser wî bin, ji teref Hatiye gotin. Helbest bi teşeya xezelê hatiye nivîsîn. Mîjar; li ser rewşa civak û dinê alîkarî xwestina ji cenabê Pêxember e (s.a.w.). Bi wî şîklî weke mededname dikare were

⁶³ Xewsê Hîzanê bernavka Seyyid Sibxetullahê Erwasî ye. Seyyid Sibxetullah li gundê Erwasa Muksa Wanê hatiye dinyayê. Li gelek deveran medrese xwendiyê û tehsîla tesewwufê stendiye. Xelfetiya terîqetê ji Seyyid Tahayê Nehrî (w. 1853) wergirtiye. Di sala 1870 ê de li Xeyda wefat dîke. Ji bo agahiyên zêdetir bnr: (Çakır, 2016).

⁶⁴ Şêx Mehmûdê 'Erbowî lawê Şêx Muhammedê 'Erbowî ye. Di sala 1934an de li gundê 'Erbo ku girêdayî bi Hawêlê ve ye hatiye dine. Piştî ku li medreseyên herêmê dixwîne li Oxînê ji Şêx Xalidê Oxînî icazeya 'ilmî werdigire. Li gundê Qutlika Bedlîsê dest bi melatiyê dîke û medreseya xwe li wir ava dîke. Temamê melatiya wî li Qultik derbas dibe. Di sala 1996 an de rehmet dîke û li heman gundî dihê veşartin. (Mela Nûrullah, Mela-Muderris, Hevpeyvîn, Lawê Şêx Mehmûdê 'Erbowî, Bedlîs, 15.01.2025. Bi Rêya telefonê).

⁶⁵ Xewsê Geylanî yek ji bernavkên Şêx 'Ebdulqadirê Geylanî ye. Şêx 'Ebdulqadirê Geylanî avakerê terîqeta Qadirî ye. Di sala 1077-1078an de li gundê Neyfê ya girêdayî bi Gîlanê ve ye hatiye dinê. Xelfeyê Ebu Se'id El Mûbarek bîn 'Elî el Mehzûnî ye. Di sala 1166-1167an de rehmet kiriye. Meqbera wî li Bexda ye. Ji bo agahiyên berfireh bnr: (Zehîr, 2005, r 264-266).

⁶⁶ Ev helbest hem di keşkûla Qoxî de û hem di keşkûla Mela Şeyxmûs de di binê navê Derwêş Mehmûd de hatiye nivîsîn. Ji ber vê me jî sernavê helbestê bi şîklî danî. Di herdu keşkûlan de jî di malika dawî de navê "Mehmûd" cih digire. Bnr: (Qoxî, 2022, r 414-416; Şeyxmûs, 2014, r 125-128).

hesibandin. Di derbarê Derwêş Mehmûd de me tu agahî bi dest nexist. Ji ber ku malika dawî nayê xwendin me nenivîsand.

Hatim ber dergahê rehmet ya Resûlellah meded
Babê şefqet babê rehmet ya Resûlellah meded

2.2.3.24 Helbesta Mehmûdê Bereşî

Sernavê helbestê bi vî rengî ye: "Qesîdetun qale Mehmûd 'elennebî sellellahû 'eleyhî wesellem." Wate: qesîdeyeke Mehmûd li ser Pêxember silavê Xweda li ser wî bin gotiye. Helbest bi teşeya terci'î benda muxemmes hatiye nivîsîn û ne't e. Di derbarê şa'irî de me tu agahî peyda nekir.⁶⁷ Ev ne't di keşkûlê de ji heşt benda pêk hatiye.⁶⁸

Min dî şeva cum'eê dilberek ez bûm xulam
Çûm tewafa rê û laman dilberek şirîn humam
Şewqa nûra xett û xalan dil mufferreh bû tamam
Esmerê min dilberê min li te bî panc sed selam
Seyyidê min serwerê min li te bî yuz bîn selam

...

Ez Mehmûdê gunehkar im hêvîya min tu Beqî'
Av û axê min bibî tû wî li nav erdê Beqî'
Wî li nig mehbûbê Barî dê ji bo me bit şefî'
Esmerê min dilberê min li te bî panc sed selam
Seyyidê min serwerê min li te bî yuz bîn selam

2.2.3.25 Helbesta Mela Emînê Uşnûyî⁶⁹

Sernavê helbestê weha ye: "Hazîhî qesîdetun qale Mela Emîn." Wate: ev qesîdeya hanê Mela Emîn gotiye. Helbest bi teşeya terkîbî benda muxemmes hatiye nivîsîn. Mijara helbestê evîn e. Helbest ji çar benda pêk hatiye. Ev helbest di eslê xwe de bi Kurdiya Soranî ye. Xuya ye ku nasixî hem di bêjeyan de û hem di rêza risteyan de destkarî kiriye. Di dîwana Mela Emîn de ev helbest pênc bend e.⁷⁰

Îro ku bi hicranê tû bîmar e dilê min
Şewaw û perişan û birîndar e dilê min
Wellahî bi 'şqê tû giriftar e dilê min
Muştaqê mullaqata ey ruxsar e dilê min
Sin'anî sifet talibê zunnar e dilê min

...

Ey bulbulê esrarê yarê di emîn e

⁶⁷ Li navçeya Dihê (Erûh) gundek bi navê Bereşa (Oymakılıç) heye. Helbestavan ji vî gundî ye yan ne ji vî gundî ye ji me re ne diyar e.

⁶⁸ Ev helbest di keşkûla Celîlê Celîl de neh bend û malikeke. Bnr: (Celîl, 2004, r 116-117).

⁶⁹ Mela Emîn, di sala 1889an de li bajarê Şîno hatiye dine. Şîno, bajarekî Îranê ye ku bi Turkî û Iraqê re hevmerz e. Di sala 1889an de li Şîno rehmet dike. Diwaneke helbesta û mewlûdnameyek ji me re mirat hiştiye. Bnr: <https://p30city.net/printthread.php?t=23555&pp=40&page=5> (Pêgihîn: 16.01.2025)

⁷⁰ Bnr: (Uşnûyî, 1377, r 126).

Ma der qesebê şehre Şinû yarê metîn e
 Belkî bike rehmê li dergahê Medîne
 Belkî bike rehmê li dergahê Medîne
 Car carîha talibê zunnar e dilê min

2.2.3.26 Helbesta Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepî

Sernavê helbestê weha hatiye dayin: "Hazîhî qesîdetun qîle ‘ela Şahê Neqşebend quddîse sirrûhû." Wate: ev qesîdeyeke hatiye gotin li ser Şahê Neqşebend Xweda sir û razên wî pak bidêre. Ev helbest medîheya Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepî ye li ser Şahê Neqşebend. Destpêka helbestê weha ye: “Kelbê Şahê Neqşebend im ta li dunya zinde me.” Di keşkûlê de û di çapên dîwana Aqtepî de ev medîhe 10 bend e.⁷¹ Di vê were gotin di keşkûlê de risteyek li her bendekê zêdebû ye. Ê ev yek di xwendina qesîdevanan de jî dihê dîtîn.⁷² Herweha di keşkûlê de û di çapê dîwanê de rêza risteyan hevûdu nagirin. Hem di keşkûlê de û hem di xwendina qesîdevanan de ev riste li her bendekê hatiye zêdekirin.

"Sed meded pîrê terîqê kelbê dergahê te me"

2.2.3.27 Helbesta Mela Mûsayê Mizî

Sernavê helbestê weha hatiye dayin: "Î’lem hazîhî qesîdetun qîle ‘ela Hedretu’n-Norşîn ‘ela wefatihî." Wate: Bizanîbin ev qesîdeyeke hatiye gotin li ser wefata Hedretê Norşîn. Di sernavê helbestê de û di helbestê de nav û nişana şa’irî xuya nake. Zeynelabidîn Zinar û Mela Şeyxmûs⁷³ Ji bo vê helbestê sernavê Mela Mûsayê Mizî danîne. Ji ber vê me jî sernavê vê helbestê weha danî. Teşeya helbestê terkîbî benda muxemmes e. Ê ji cureyên nezmê mersiye ye. Di keşkûlê û di berhema Mela Şeyxmûs de helbest ji şeş benda pêkhatiye. Di berhema Zinar de helbest heft bend e lê ji benda hefta tenê risteya wasiteyê heye.

Ger şêstî ‘umur kim û bimînim li heyatê
 Bêjim ji ewel da kul û derdê di sibatê
 Nabit ku xelas bin ji ewel ta sekeratê
 Hêvî ji Xweda min bide sebr û qene‘atê
 Minet ji Xwedê ra ku ji bo min hewes î

...

Billah me digotî siyema piştî selata
 Rehmê tu birêjê weke qetrê meterata
 Ser ‘asiyû miskin çi heyat û çi memata
 Mesken ku tijî bin weke bîr û qenewata
 Ger qeht û xela ye tu ji bo me ‘eles î

⁷¹ Bnr: (Aqtepî, 2022, r 68-69).

⁷² Bnr: <https://www.youtube.com/watch?v=ZS38va6kAW0> (Pêgihîn: 16.01.2025)

⁷³ Bnr: (Zinar, 1991, r 263-265 ; Şeyxmûs, 2014, r 81-82).

2.2.3.28 Helbesta Mela Mehemed Emînê Heyderî

Ev helbest bi vî sernavî ye: "Qale Heyderî 'ela Şahê Xiznewî quddîse sirrûhû." Wate: Heyderî li ser Şahê Xizna gotiye. Helbest, tercî'î benda museddese e û ji cureyên edebî medîhe ye. Hejmara benda şeş e.

Nêrgîza baxê cinanan xewsê 'alem e' zem e
 Ez ji ber le'lê şeker taca te pir sermestem e
 Me'dena 'ilm û terîqê ez feqîr im hewce me
 Pur gunehkar im zelil im ez geda şermende me
 Ez dexîlim babê Me'sûm saîl im bê çare me
 Sed meded pîrê terîqê kelbê dergahê te me

...

Warîsê şer'a Mûhemmed hem terîqa neqşebend
 'Alîmê Rûm û 'Ecem, Kurd û 'Ereb deşt û beled
 Ez ricakar im Îlahî dewleta tekya ebed
 Heyderîzade bibexşî Şahê Xizna el meded
 Ez dexîlim babê Me'sûm saîl im bê çare me
 Sed meded pîrê terîqê kelbê dergahê te me

2.2.3.29 Helbesta Şêx 'Ebdulhelîm

Di keşkûlê de sernavê helbestê bi tevahî nayê xwendin. Bêjeya dawî "Li Dunyaê" ye ku ev bêje bêjeya yekem ya helbestê ye. Herweha gelek risteyên helbestê jî nayê xwendin. Di keşkûlê de şeş bend e û nav û mexles ne diyar e. Di Keşkûla Celîlê Celîl de ji bo vê helbestê hatiye gotin ku ya Şêx 'Ebdulhelîm e.⁷⁴ Di vê berhemê de helbest 30 bend e. Di navbera berhema Celîlê Celîl û bendên keşkûlê yê dihên xwendin de cudahî dihê dîtîn. Benda yekem:

Li dunyaê mekin.....
Xilasbûn li me meh û salan	Ez im muhtacê xufranê
...	
Hawara me ji destê qebrê	Can şewwitî şubhê xebrê
Li ser me nekin 'uzrê	Ez im muhtacê xufranê

2.2.3.30 Menzûmeyaya Esmau'l-Husna ya Mela Ehmedê Hezanî

Sernavê menzûmeyê weha ye: "Hazîhî nezmu Esmau'l-Husna nezemehû Mela Ehmed el-Hezanî." Wate: ev menzûmeyaya navên Xweda yê xweşik in Mela Ehmedê Hezanî⁷⁵ nezm kiriye. Lê mixabin ev rûpel qet nayê xwendin ji ber vê em neşên derbarê vê menzûmeyê de agahiyan bidin.

⁷⁴ Bnr: (Celîl, 2004, r 176-179).

⁷⁵ Ji bo jîyan û keseyata edebî ya Mela Ehmedê Hezanî bnr: (Karak, 2023).

2.2.3.31 Helbestên xwediyên wan ne diyar

1. Sernavê helbestê weha ye: "We 'ela haza qîle 'alîmun min 'ûlemaizzeman la e'rifu men hûwe." Wate: li ser vê⁷⁶ 'alimek ji alimên dema me gotiye, lê ez nizanîm bê ew kî ye. Teşeya helbestê qesîde ye, ji cureyên nezmê îstîqbal e⁷⁷ û mijar xwe biçûk dîtî e. Helbest bi tevahî 64 malik û risteyek e.

Ne berrî me ne behrî me ne nar û nûrê nîran im
Ne tarî me ne ronî me ne roj û hîvê mîzan im

...

Ne Dêrgizî ne Dimbilî ne Bamistî ne Tizyan im
Li Barava doximlî me li 'Erebkenda Mîr 'Usman im
Hezar û sêsed û sî me dido dî çû ji hicran im⁷⁸

2. Sernavê helbestê weha ye: "Qesîdetun qîle 'ela Hedret quddîse sirrûhû." Wate: Qesîdeyek li ser Hedret⁷⁹ hatiye gotin, Xweda sir û razên wî pak bidêre. Bi teşeya qesîdeyê hatiye nivîsîn, ji cureyên nezmê mersiye ye û 8 malik e. Mexles û navê helbestvan ne diyar e.

Gelek îro birîndar im ji hicra Hedretê Sanî
Gelek mecrûh û bêçar im ji hicra Hedretê Sanî

...

Dilê mecrûh me'anî bû bi husnê mahê sanî bû
Ji Mewlayî xefanî bû gelo ka Hedretê Sanî

3. Ev helbest bi vî sernavî hatiye nivîsîn: "Qesîdetun qîle 'ela Seyyid Muhammed Raşid." Wate: qesîdeyek hatiye gotin li ser Seyyid Muhammed Raşid. Ji teşeyên nezmê terci'î benda museddîs e, ji cureyên nezmê medîhe ye û helbest şeş bend e.⁸⁰

Ey gelî dost û bira rabin hemî bi 'erd û 'iyal

⁷⁶ Mebesta nivîskarê keşkûlê ji peyva "li ser vê" anku li ser helbesta Şêx 'Elaeddîn e. Yanî 'alimek ji alimê dema nivîskarê keşkûlê li ser helbesta Şêx 'Elaeddîn ya yekem ev helbest hûnaye.

⁷⁷ Îstîqbal ew cureya nezmê ye ku şa'irek bi tesîra şa'irekî beriya xwe bi heman mezmûnan, bi heman kêş û serwayê şî'rekê bihûne. (Humayî, 1373, r 403.) Di heman demê de Îstîqbal hemwateya Îqtîfa, Îqtîda, Tetebbu', Bersivdayin û Nezîreyê ye.

⁷⁸ Li gorî salnameya hicrî 1332 dihê beramberî 1913/1914 ê salnameya mîladî. Li gorî vê dîrokê ev helbest beriya helbesta Şêx 'Elaeddînê Xiznewî hatiye nivîsîn. Li ser van agahiyan em dikarin bibêjin ev helbest Îstîqbala helbesta Mewlana ye. Lewra destpêka helbestê ji malikeke helbesta Mewlana hatiye wergirtin. Malik weha ye.

Ne şerqiyyem ne xerbiyyem ne berriyyem ne behriyyem,

Ne erkanê tebi'yyem ne ez eflaki gerdanem.

(Ne şerqî me ne xerbî me ne berrî me ne behrî me, ne stûnek xezayî me ne felekên gerdûnî me.) (<https://ganjoor.net/moulavi/shams/ghazalsh/sh633#comment-113713> Pêgihîn: 04.01.2025)

⁷⁹ Hedret û Hedretê Sanî, bernavka Şêx Muhammed Diyauddîn e (q.s.). Şêx Muhammed Diyauddîn, di sala 1855 an de li gundê Uspê ku giridayî bi navçeya Hîzana Bidlîsê ve ye hatiye dinê. Lawê Şêx 'Ebdurrehmanê Taxî (q.s.) ye. Xelîfetiya terîqetê ji Şêx Fethullahê Werqanîsî (q.s) werdigire û di dala 1923 yan de li Norşînê wefat dike. (Çağlayan, 1996, r. 201-202).

⁸⁰ Ev helbest û helbesta Mela Nezîr ya di rêza pêncê de zêde dişibin hev. Pêkane ku ev helbest jî ya Mela Nezîr be.

Her ne derga şahê menzil sahibê husn û cemal
 Şekl û sîma mislê bedra asîmana pur kemal
 Qelb û dil mesrur bitin ew ji nezer wî çav xezal
 El meded şahê Bûxara sahibê husn û cemal
 Sed meded pîrê terîqê murşidê bê qîl û qal

...

Tu nezer ke ey şehê me hilde vê êşê ‘emîm
 Min dewakî dil birin îm ez ji ber cerha qedîm
 Sahibe husn û melahet dawiyê derdê elîm
 Kelbê dergahê te me ez ber derî mame mûqîm
 El meded şahê Bûxara sahibê husn û cemal
 Sed meded pîrê terîqê murşidê bê qîl û qal

4. Sernavê vê helbestê bi vî rengî ye: "Hazîhî qesîdetun qîle ‘ela selasetun mîne’l meşayîxî."
 Wate: ev qesîdeyeke hatiye gotin li ser sê meşayîxa. Ev helbest ji layê teşeyê nezmê ve tercî’î benda murebbe’ e. Ji cureyên nezmê medîhe ye. Ji layê hûnandina helbestê ve jihevketî ye. Hejmara kîteyên malikên wasiteyê hevûdu nagirin. Pêkan e ku kesekî li ser helbesta resen destkarî kiribe. Helbest heft bend e.

Îro medî şeyxek mezin	Daxek dida cergê di min
Zarîn û fîxan çûn ji min	Hedret medet me j bîr meke
...	
Feryad ji destê dilberê	Kuştim bi derba xencerê
Anîme ser kewna berê	Hedret medet me j bîr meke

5. Sernavê helbestê weha ye: "Qesîdetun qîle ‘elêl Xews." Wate: Ev qesîdeyeke li ser Xews hatiye gotin. Helbest bi teşeya tercî’î benda muxemmes hatiye nivîsîn û ji cureyên nezmê mersiye ye. Bi giştî heft bend e.

Ah û hesret ah û hesret ah û hesret hey hewar
 Hey hewar e li me feqîran hey hewar û sed hewar
 Îrtihal kir Şahê Qesrê em diman bê dost û yar
 El meded Şahê li Qesrê tobedarê derge me
 ‘Asiyû mecruh im ez her telebkarê melhemê

...

Çûn tewafa Şahê Qesrê cinn û însan û melek
 ‘Aşiqê çavê munewwer awirê çavê belek
 Nisbetek bavêj li ser feqîr seyyidê min pur gelek
 El meded Şahê li Qesrê tobe darê derge me
 ‘Asiyû mecruh im ez her telepkarê melhemê

6. Sernavê helbestê weha ye: "Hazîhî qesaîdun qîle ‘ela seyyîdîna eş-Şeyx Seyyid Muhammed Raşid el-Huseynî quddise sîrrûhû." Wate: ev qesîdena li ser seyyidê me Şêx Muhammed Raşid el-Huseynî hatine gotin. Helbest bi teşeya tercî’î benda murebbe’ hatiye nivîsîn û medîheyek 6 bendî ye.

Seyda Mûhemmed Raşid e
 Daîm li menzil qa'id e
 Meşreq û mexreb qabid e
 Ya Reb bidî wî nusretê

...

Mîm û Şîn û Qaf qasî
 Ra û Ha û Sîn 'asî⁸¹
 Seyda tu wî nekî nasi
 Ya Reb bidî wî nusretê

7. Di sernavê helbestê de; "Welehû eyden" hatiye gotin. Anku dîsa ew dibêje. Ji naveroka helbestê em têdigihêjin ku medîheyeke li ser Şeyx Seyyid Muhemmed Raşid el-Huseynî. Ji teşeyên nezmê terkîbî benda murebbe' e. Ji 10 bendan pêk hatiye.

Cennetul firdews û me'wa 'inde Raşid bil yeqîn
 Hewdeya kewser li bale zû bikin ey muminîn
 Herne cem sultanê sanî ey gelî ixwanê dîn
 Ez zelil im ez heqîr im seyyidê min kulle hîn

...

Hem ew e Beytu'l-heram bûna feqîran xas û 'am
 'Utbeta sultan şifa ye lew ji bona zu'l-enam
 Ruyeta qutbê Bûxara misle hecc e fiddewam
 Kullû men cae îleyhî sax dibe ji cerhê hezîn

8. Sernavê helbestê; "Welehû eyden e." Yanî; dîsa ew dibêje. Di vê helbestê de fedl û kemalata Seyyid Muhemmed Raşid el-Huseynî hatiye ziman. Bi vî rengî cureyê helbestê dibe Medîhe. Bi teşeya tercî'î benda murebbe' e. Helbest bi 13 benda hatiye hûnandin. Di helbestê de derbarê nav û mexlesa şa'irî de tu nişan neyê dîtin.

Îro zemanê axir e	Seyda ji nesla tahir e
Îro li Bûxara zahir e	Herin herin bi leyl û nehar

...

Bi şert û şurûtan kamil e	Der suhbetê wek bulbul e
Ji suhbetê ra qabil e	Herin herin bi leyl û nehar

9. Sernavê helbestê; "Welehû eyden e." Yanî; dîsa ew dibêje. Ji naverokê xuya ye ku ev helbest medîheyeke li ser Seyyid Muhemmed Raşid el-Huseynî. Bi teşeya tercî'î benda murebbe' hatiye hûnandin. Ji 12 malikan pêktê. Di derbarê şa'irî de tu nav û nişan nehatiye diyar kirin. Benda yekem:

Ey dîlberê ey dîlberê	Qamet ji dara 'enberê
Weçek şems û yek qemerê	Bedra mûnîra der sema

...

Gelî bira tesdîq bikin	Sultan ew e tehqîq bikin
Ji bo wî her du'a bikin	Bedra mûnîra der sema

⁸¹ Helbestvan weke mexles hinek herf bikaranîne di malika dawî de ku: M, Ş, Q û R, H, S ye. Lê me ji van herfan tu nav dernexist.

10. Sernavê helbestê weha hatiye nivîsîn: Welehû Quddîse Sîrrûhû'l-'elîyye eyden. Wate: dîsa di derbarê wî de Xweda sîrr û razên wî pak bidêre hatiye gotin. Helbest bi teşeya terkîbî benda murebbe' hatiye nivîsîn. Medîheyeke neh bendî ye ku li ser Seyyid Muhemmed Raşid el-Huseynî hatiye hûnandin. Di benda dawî de şa'ir herfên sere navê xwe weke mexles aniye ziman. Ji van herfan navê Muhemmed dertê holê. Lê ev nav bi tenê ji me re şa'irî eşkera nake.

Xizna îro bûye zahir wê l'Bûxara bilyeqîn
Qesd bikin dergahê şêran xasseten hûn muznibîn
Îftixara neqşiyar e Raşidê ehlê zemîn

Wez kuleyb im wez kuleyb im wez kuleyb im wez kuleyb

...

Mîm û Hê û Mîm û Dal îro di xurbet bê mecal
Pur wuqu' bû hem di nava zulm û 'isyan la mecal
Raciyê 'efwa zunûban mînel kerîmê la yezal

Wez be'îd im wez be'îd im wez be'îd im wez be'îd

11. Sernavê helbestê weha nivîsandiye: "Qesîdetun qîle 'ela Şahê Xiznewî quddîse sîrrûhû." Wate: ev qesîde li ser Şahê Xizna hatiye gotin, Xweda sir û razên wî pak bidêre. Bi teşeya qit'eyek musemmet hatiye nivîsîn. Di keşkûlê de şeş malik e û ji cureyên edebî medîhe ye. Nav û nişana şa'irî xuya nake.

Rehmet ji Rehmanurrehîm barî li Xiznayê mûqîm
Ew padîşahê pur helîm bû mesnedê vê ummetê

...

Nalîn kirin dan zare zar kan Mehdiyê bi'l-i'tîbar
Lew derd li min bûne xedar 'Îse'l-Mesîh kengî tu tê

12. Sernavê helbestê bi vî rengî ye: "Qesîdetun 'ele'd-dunya." Wate: Qesîdeyek li ser dunyayê. Helbest bi teşeya çarpareyê hatiye nivîsîn û çar bend e. Weke ji sernavê wê xuya dike ev helbest li ser bêwefabuna dine hatiye nivîsîn. Di helbestê de mexles cih nagire. Di dawiya helbestê nîşeya; Temmet, anku bi dawî bû hatiye danîn.⁸²

Dilo ya pîr bikêr naê Mebe yoldaşê dunyaê
Kesê dunya bi dil girtî Ew e mehrûm ji 'uqbayê

...

Dilo cellad cihangîr e Wî kuştî bab û bapîr e
Şev û rojê dike qetlê Nabêje pîr e yan jîr e

13. Sernavê helbestê tenê "Qesîde" hatiye danîn. Helbest bi teşeya terci'î benda murebbe' e û ji cureyên nezmê munacat e. Bi tevahî 12 bend e. Mexles û nav nehatiye diyarkirin.

⁸² Ev helbest bi deng di malperan de cih digire. Di malperekê de Hafîz Menduh vê helbestê dixwîne û di xwendina wî de helbest 10 bend e. Di benda dawî de "Saîl" weke mexles derbas dibe. Bnr:(https://www.youtube.com/watch?v=V0pg4B5sB_k&ab_channel=H.Haf%C4%B1zMemduh-Topic (pêgihîn 10.01.2025))

Ji bo Ehmed hurmet bikî	Ya Reb derê rehmê vekî
Qebrê li me tarî nekî	Esîr û sergerdan im ez
...	
Ewan kesê bi zenb û 'isyan	Du'a dîkin bi qelb û can
Ya Reb qebûlkî van dû'an	Esîr û sergerdan im ez

14. Sernavê helbestê weha ye: "Hazîhî qesîdetun Ya Reb Tu Kerîm î". Wate: ev qesîdeya "Yareb Tu kerîm î" ye. Helbest bi teşeya xezelê hatiye nivîsîn. Bi tevahî 15 malik e û ji cureyên edebî dikeve nava munacatan. Di helbestê de nav û nîşanek ku şa'ir diyar bike nehat dîtin.

Ya Reb tu Kerîm î tu Rehîm î tu 'Ezîm î
 Ji ezel da tu Qedîm î tu ebed kadê rewa î
 ...
 Ya Îlahî tu 'efûkî herçi min kirye ji biçûk
 Heta vêga tev 'efû kî hem ji niha da ya Xwudaî

15. Sernavê vê helbestê bi vî rengî hatiye danîn: "Qesîdetun qelbo rabe tu batinî." Wate: qesîdeya qelbo rabe tu batin î. Teşeya helbestê terkibeke cuda ye. Di hersê bendê pêşî de risteya wasîteyê "Herdem girî li halê me tê" ye. Ji benda çara pê ve di bendekê de "Rebbî ehfîzna ji nîranî" û di bendekê de jî "Herdem girî li halê me tê" dihê dîtin. Bi vî rengî terkîb û terci'î bend di vê helbestê de têkilî hev bûye. Bi wê şêwazê dibe helbesteke xweser be ji layê teşeyê ve. Nav û nîşana şa'irî ji helbestê diyar nabe. Pêkan e ku helbest kêr hatibe îstînsaxkirin. Em di çavkaniyan de negihîştin şa'irê vê helbestê. Helbest bi giştî 15 bend e.

Qelbo rabe tu batin î	Zîkrê bike tu her demî
Di qebrê da tu sakin î	Herdem girî li halê me tê
...	
Qelbo rabe mebe xemgîn	Nefsa zalim nabe emîn
Hêvya me Rebbî'l-'alemîn	Herdem girî li halê me tê

16. Ev helbest sisilenemayeke terîqeta neqşibendi ye. Sernavê sîlsîlenameyê weha hatiye danîn: "Nezmû silsileî Sadati'l-Kîram." Wate: menzûmeya sîsîleya sadatên kiram e. Ev sîsîlename ji Pêxember (s.a.v) dest pê dîke û bi Şeyx Seyyid Muhemmed Raşîd el-Huseynî bi dawî dibe. Sîlsîlename bi teşeya xezelê hatiye nivîsandin û bi tevahî pênc malik e.

Bi Ehmed serwerê şahan Ebû Bekr û we Selmanî
 Bi Qasim Ce'ferû Sadiq bi Teyfûr û bi Xirqanî
 ...
 Bi Seyda û bi Fethullah bi Hedret Şahê Norşînê
 Bi Ehmed Şahê Xiznaê bi Xews û hem bi Sultanî

3 ENCAM

Di vê xebatê em li ser jîyan, berhem û danasîna keşkûleke Mela Nezîrê Hergemoyî sekinin. Her çend ku ji layê serdema îstînsaxê keşkûleke nuh be jî, ji layê naveroka xwe ve dagirtiye û ji layê helbestên di keşkûlê de gelek girîng e.

Di vê keşkûlê de bi tevahî bêyî du helbestên duberekirî 79 helbestên ciwayaz cih girtine. Di nava van helbestan de hem şî'r û hem jî menzûme dihên dîtin. Di vê keşkûlê de ji edebiyata 'Erebî yek, ji edebiyata Farsî ji sê şa'irên navdar pênc û ji edebiyata Kurdî ji sih şa'irî heftê û heşt helbest cih digirin. Xala muhîm ev e ku şanzdeh helbestên ku şa'irên wan ne diyar in di keşkûlê de têne dîtin. Ji ber piraniya hebestên Kurdî em vê keşkûlê weke keşkûleke Kurdî dikarin bihesibînin.

Di vê keşkûlê de şeş helbestên mustensixê keşkûlê cih digire ku pênc helbest ji wan di dîwana wî (dîwana wî destxet e û li ber deste me ye) de cih nagirin. Herweha menzûmeyek mustensixî jî, ku ji metnek pexşan bi nezm wergerandiye û ji layê wergêrê ve giring e em bi vê keşkûlê jê agahdar dibin. Ev jî xaleke girîngiya vê keşkûlê.

Weke rêbazeke keşkûlan bi gelemperî mustensixên keşkûlan helbestên li gorî zewq û selîqeya xwe berhev dikin û dicivînin. Helbestên di vê keşkûlê de bi tevahî helbestên tesewuffî nin. Eger em dabeş bikin, ji xeyrê çend helbestên sereke, weke helbestên Feqiyê Teyean, Hafîzê Şîrazî û Şemsê Tebrîzî û Mewlana Camî, helbestên dîtir medîhe û mersiye nin ku li ser şêx û murşîdên terîqetan hatine nivîsîn. Bi gelemperî jî li ser şêx û murşîdên terîqeta neqşebendî. Ji ber vê em bi asanî dişên bibêjin ku ev keşkûl, keşkûleke edebiyata dergahî ye.

Ji edebiyata Farsî helbesta Mewlana Camî di vê keşkûlê de jî cih girtiye. Her çend ev helbest di çendîn keşkûlan de cih girtibe û bi deng hatibe xwendin jî ev helbest di dîwana şa'irî de cih negirtiye. Dîsa ji helbestên Şemsê Tebrîzî sê helbest dihên dîtin ku di dîwana Mewlana de cih nagirin.

Di vê keşkûlê de 16 halbestên bê mexles derbas dibin ku şa'irên wan ne diyar in. Bi vê keşkûlê em navê; Hesenê Êstîrî, Mela Qasim, Mela 'Ebdulhemîd, Şêx 'Ebdulhekîmê Qesrewî el-Huseynî, Mela 'Ebdullah, Mela Mehemed Emîn, Mela Xelîl û Mela Ni'metullah cara yekem dibihîzin. Herweha em bi vê keşkûlê têdigihêjin ku Mela Ehmedê Hezanî menzûmeyek derbarê Esmâ Husna de nivîsandiye.

Xaleke girîng ya vê keşkûlê ev e ku du helbestên Feqiyê Teyran, ku di çapên dîwana wî de cih nagirin hatine nivîsîn. Helbet di pêşerojê de li ser van helbestan divê nirxandinên akademik û edebî werin kirin. Me di vê xebatê de bes ji herdu helbestan malikên serî û malikên dawî nivîsand. Helbestên Feqiyê Teyran yê dîtir ji layê rêza malikan û ji layê bêjeyan ve ji çapa wezaretê ciyawaz xwuya kir. Ev yek di pêşerojê de ji bo xebatên edîsyon-krîtîk dê bibe çavkaniyeke girîng.

Helbestên di keşkûlê de ji layê teşeyên nezmê ve gelek rengîn in. Di keşkûlê de em rastî teşeyên ciyawaz hatin. Bi vê yekê em fam dikin ku edebiyata Kurdî ji layê teşeyên nezmê xwedî taybetiyên xweser e. Herweha mulemme'ên ciyawaz jî di keşkûlê de dihên dîtin ku ev yek şarezabûna şa'iran diyar dike. Lazim e were gotin du mînakên hunera îstîqbalê di vê keşkûlê de cih digirin ku di pêşerojê de ji bo kesên li ser edebiyata Kurdî ya klasîk lêkolînê bikin ewê bibin çavkanî û textên girîng.

ÇAVKANÎ

- Aktan, M. (2019). *Şeyh Alaaddîn El-Haznevî'nin Hayatı ve Tasavvufî Kişiliği*, (YÖK Tez Merkezi, Yüksek Lisans). Erciyes Üniversitesi.
- Tenik, A. (2015). *Tarihsel Süreçte Kürt Coğrafyasında Tasavvuf ve Tarikatlar*. Nûbihar.
- Axtepî, Ş. 'E. (2022). *Dîwana Rûhî*, Amadekar: Zeyneb Kılıç Yıldız. Kültür ve Turizm Bakanlığı.
- Aykaç, Y. (2021). Danasîn û Tewsîfa Mecmû'eyên Helbestan di Koleksiyona Aleksandre Jaba de, *Kurdiyat*, 4, 23- 60.
- Aykaç, Y. (2022). Tewsîf û Danasîna Keşkûla Kurdî ya li Pirtûkxaneyaya Meclîsê Şûrayê Îslamî, *Kurdiyat*, 5, 31-47.
- Beyter, Ö. (2013). *Dîwana Mela Ehmedê Heyderî: Metn û lêkolîn*, (YÖK Tez Merkezi, Yüksek Lisans). Mardin Artuklu Üniversitesi.
- Bozkur, S. (2024). *Mela Nezîrê Hergemoyî û Mecmû'eya Wî (Lêkolîn-Tekst)*, , (YÖK Tez Merkezi, Yüksek Lisans). Mardin Artuklu Üniversitesi.
- Celîl, C. (2004). *Keşkûla Kurmancî*. Ayhan Matbaası.
- Cezayîrî, N. (1333). *Zuhre 'r-Rebi'* (Terc. N. M. Cezayîrî). Tabe Serah.
- Çağlayan, M. (1996). *Şark Uleması*. Çağlayan Yayınları.
- Çakır, M. S. (2016). "Seyyid Sıbgatullah Arvâsî Hizânî ve Gayda Tekkesi". *İhya uluslararası islam araştırmaları dergisi* 2(2), (Ağustos 2016), 24-42.
- Dihxuda, 'E. E. (1377). *Loxetnameê Dihxuda*, Danişgahê Tehran, 1377.
- Doskî, T. Î. (2011). *Mela 'Ebdillahê Hizanî û Şa'irên Malbata Wî*. Weşanên Spîrêz.
- Doskî, T. Î. (2020). *Baxê Îrem*, Amadekar: Mehmet Zahir Ertekin. Dara.
- Edhem X. E. (1370). *Kedû Metbexi Qelenderî* (Terc. E. Mucahîd). Întîşarati Danişgahê Tehran.
- Uşnûyî, E. (1377). *Dîwanî Emîn Uşnûyî*. Navendî Belavkirdinewey Ferheng û Edebê Kurdî.
- Ertekin, M. Z. (2016). Mela Ebdulfettahê Hezroyî (Fethî) û Qesîdetu'l-Qelema Wî (Metn-Lêkolîn), *Nûbihar akademî cild(2)*, jimar: 6, 2016, 71-103.
- Herewî, N. M. (1377). *Şêx 'Ebdurrehman Camî*. Neşri Terhi Nû.
- Humayî, C. (1373). *Funûnê Belaxet û Sina'atê Edebî*. Muesseseê Neşrê Huma.
- Karak, M. Z. (2023). Helbestkarekî Tekyaya Hezanê: Mela Ehmedê Hezanî. *The journal of mesopotamian studies*, 8(2), 171-201. <https://doi.org/10.35859/jms.2023.1353484>.
- Mewlewî, M. C. M. (1375). *Kulliyati Dîwani Şems, Mutabiq Nusxeê Bedi'uzzeman Frûzanfer*. Rad.
- Öz, R. (2023). *Antolojiya 'Eqdînameyên Kurdî*. Peywend.

- Özbek, Ö. (2023). *Seyda Mela Nezîr Hergemo (Akın), Mutasavvuf, Müellif ve Şair, Gotara Neçapbûyî*.
- Özcan, Ö. (2016). Seyyid Muhammed Râşid Erol'un Hayatı ve Tasavvufî Etkisi, e-*Şarkiyat ilmi araştırmalar dergisi*, 2016, cilt(VIII), sayı: 16, s. 765-784.
- Qoxî, E. H. (2022). *Dîwana Camî'*, Lêkolîn û Amadekariya Bo Lafînî: Cevdet Karaman. Banga Heq.
- Sadînî, M. X. (2013). *Mela Huseynê Bateyî, Jiyan, Berhem û Helbestên wî*. Nûbihar.
- Sönmez, N. (2018). Mela Ebdullahê Kotalî û Helbestên Wî Yên Kurmancî. *Nubihar akademi*, 3(9), 84-102. <https://doi.org/10.55253/nubihar.428718>.
- Sönmez, N. (2023). *Dîwana Mela Nûrullahê Godişkî*. Peywend.
- Şeyxmûs M. (2014). *Dîwanen Camî'en*, Çapa Taybet, Bê Cih û Weşanxane.
- Taşkesen, M. (2007). *Seyyid Abdülhakim El-Hüseynî'nin Hayatı ve Tasavvuf Anlayışı*, (YÖK Tez Merkezi, Yüksek Lisans). Ankara Üniversitesi.
- Teyran, F. (2014). *Dîwan* (Wer. K. Yıldırım). Kültür ve Turizm Bakanlığı.
- Xaliqî, M. R. B. (1381). *Şax-i Nebat-i Hafiz*. Zivâr.
- Yusifî, H. 'E. (1381). *Divan-i Hafiz*. Întîşaratê Ruzgar.
- Zanîngeha Dokuz Eylül, Pirtûkxaneya Destnivîsan, *Reqem: 4112/14, Wereq: 73a-b* (<https://yazmaeserler.deu.edu.tr/kasidetu-ebi-bekir-es-siddik-73a-b/>). Pêgihîn: 20.12.2024).
- Zehîr, Î. Î. (2005). *Dirasetun Fi't-Tesewwufî*. Daru'l-Îmamu'l-Muceddîd.
- Zinar, Z. (1991). *Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî*. Yekîtiya Nivîskarên Kurd.

HEVPEYVÎN

Mela Nûrullah, Mela-Muderris, Hevpeyvîn, Bedlîs, Bi Rêya Telefonê, 15.01.2025.

Mela Qasim Akın, Mela-Malnişîn, Hevpeyvîn, Qozlix, Bi Rêya Telefonê, 07.01.2025.

ÇAVKANİYÊN DIJÎTAL

<https://gysarag.blogfa.com/post/27>: (Pêgihîn: 04.01.2025)

<https://steemit.com/rumi/@tamim/h-tdb-r-a-mslmanan>: (Pêgihîn: 04.01.2025)

<https://daftaredel42.blogfa.com/post/302>: (Pêgihîn: 04.01.2025)

<https://ganjoor.net/moulavi>: (Pêgihîn: 04.01.2025)

<https://ganjoor.net/moulavi/shams/ghazalsh/sh633#comment-113713>: (Pêgihîn: 04.01.2025)

https://www.youtube.com/watch?v=OaN6I2AJq8E&ab_channel=Kasidehane. (Pêgihîn: 08.01.2025)

https://www.youtube.com/watch?v=V0pg4B5sB_k&ab_channel=H.Haf%C4%B1zMemduh-Topic (Pêgihîn 10.01.2025).


<https://habibi-rasoolallah.blogfa.com/post/50> (Pêgihîn: 15.01.2025)

<https://sozimihrab.org/%D9%BE%DB%8E%D9%86%D8%AC-%D8%AE%D8%B4%D8%AA%DB%95%DA%A9%DB%8C-%D9%84%DB%95-%D8%B3%DB%95%D8%B1-%D8%BA%DB%95%D8%B2%DB%95%D9%84%DB%8E%DA%A9%DB%8C-%D9%85%DB%95%D9%88%D9%84%D8%A7%D9%86%D8%A7-%D8%AC%D8%A7/> (Pêgihîn: (Pêgihîn: 15.01.2025)

<https://p30city.net/printthread.php?t=23555&pp=40&page=5> (Pêgihîn: 16.01.2025)

<https://www.youtube.com/watch?v=ZS38va6kAW0> (Pêgihîn: 16.01.2025)

Wêne 1. Rûpela pêşî yê keşkûla Mela Nezîrê Hergemoyî



Wêne 1. Rûpela dawî yê keşkûla Mela Nezîrê Hergemoyî

